

K.T

ZANÎNGEHA YÛZÛNCÛ YÎLÊ

ENSTÎTUYA ZIMANÊN ZINDÎ

ŞAXA MAKEZANÎSTA ZIMAN Û ÇANDA KURDÎ



TEZA LÎSANS A BİLİND

HOZANETÎ DI HOZANÊN SEBİRÎ BOTANÎ DA

Amadekar

Hareem Haji Sulaiman

WAN- 2017

K.T

ZANÎNGEHA YÛZÛNCÛ YÎLÊ

ENSTÎTUYA ZIMANÊN ZINDÎ

ŞAXA MAKEZANÎSTA ZIMAN Û ÇANDA KURDÎ



TEZA LÎSANS A BİLİND

HOZANETÎ DI HOZANÊN SEBİRÎ BOTANÎ DA

Hareem Haji Sulaiman

ŞÊWIRMEND

Doç. Dr.Vechi sönmez

WAN- 2017

KURTE

POYETÎKA DI HOZANÊN SEBIRÎ BOTANÎ DA

Botanî şexsiyeteke naskirî ye di wêjeya kurdî ya nû de. Di heman demê de zanayekî mezinê îslamêye.

Eger di nav kurdanda û kurdistanêda bi dirêjahya hebûna kurdan hozana folklorî paşya nvêsi rolekê berşçav û serekî di hemû meydanên jyana gele kurdda dîtîbît: hozana SEBIRÎ BOTANÎ jî ji vî rengê hozanêye.

Berhemên BOTANÎ bi giştî û hozanên bi taybetî ya arastekirî û armanic bere, ew û hozanê xwe mîna hevalcêmkane û berdewam di qada xebat û têkoşanêdane, hozana wî çirîskên şorişek hizrî, siyasî, civakî, rewşenbîrî jê dîpeşin.

BOTANÎ hozanvanekê pêgir bû, karî ji nava xelkê xwe rabît û serkêşyekê biket û sent û sitratîjekê taybet girte ber. Berdewam yê di sengerazadî û rizgaryê da bû.

Di heman demda bi çî renekî berhemê wî ji berhemên mrovayetyê nahêne cudakim û pişkeka girnge jî turê bergiryê.

ÖZET

SABRİ BOTANI ŞİİRİ İLE ŞİİR

Şiir, edebi biçimler ve edebi söylem teorisidir. Özellikle şiir teorisine atıf yapabilir.

Bu araştırma SABRİ BOTANI'nin şiir şiirini içermektedir. Genel olarak, şiirleri son derece objektif bir anlatımdır, çünkü belirli bir vatanseverlik ve milli duygu motifini içermektedir.

Araştırma ayrıca, sosyal, nezaket ve apolitik hayatı gözenek aşamalarına ve şiirini nasıl organca uyguladığının sanatsal resmine de uyguladı. Şiirinden çıkan bazı makaleler, kullanılan dil ifadesi ve genel tayfsallık açısından tartıldı ve tartıldı ve icra edildi. Şiir metoduyla niceliksel olarak çıkarılan önemli konular vurgulanmıştır.

Sonuçta amaçlarımıza ulaşmak için analitik ve tanımlayıcı syl-labus'u kullanmamız gerekir. Araştırmamız süresince şair sabree BOTANI'nin halkının acısını ve hüznünü yaşayan ve gördüğü siyasi şairlerden biri olduğu düşünülürken birtakım sonuçlara vardık. Şiir amaçlarının çoğu, insanları, haklarını protesto etmek ve yükseltmek için teşvik etmektir. Şiiri dürüstçe direnişin ve haksızlığa karşı önemli bir edebiyat çemberi olarak kabul edildi.

Ayrıca, şiir dili basit kabul ediliyor ve halkın olgunluk duygusunu ifade ediyor; gerçek toplumsal durum ve bağımsızlık ve barışçı yaşam mücadelesi boyunca ne kadar acı çekiyorlar.

SUMMARY

POETRETY IN POETRY BY SABRI BOTANI

Poetics is the theory of literary forms and literary discourse. It may refer specifically to the theory of poetry, although some speakers use the term so broadly as to denote the concept of "theory" itself.

This reserch includes the poetry in poetry by SABRI BOTANI. In general, his poems are highly objective expressive, since it contains a particular pattern of patriotic and national feeling aimed.

The search conducted also, to the pore's stages of social, courtesy and apolitical life, and the artistic picture of how he organized his poetry as well. Some articles from his poetry were analyzed for language expression used and for the overall spectarcularity, weigh and performer. The important subjects which are quantitively exited by his poems method were also emphasized.

Eventually we have to use the analytical and descriptive syllabus to reach our aims. During course of our research we reached several conclusions, included, that the poet sabree BOTANI is considered one of the political poets, who lived and saw the pain and sadness of his people. Most of his poetry purposes were to urge people to protest and upraise for their rights. His poem was honestly considered as important literature ring for the resistance and against injustice.

Also, his language of poetry considered to be simple and express the feeling of the maturity of his people, which include the actual social situation and how much they suffer during their struggle for the independent and peaceful living.

NAVEROK

KURTE.....	II
ÖZET.....	III
SUMMARY	IV
NAVEROK	V
PÊŞGOTIN.....	VII
KURTEBÊJE.....	IX
1. JYANA KESÎ Û WÊJEYÎ YA SEBIRÎ BOTANÎ	1
2. POYETÎKA	6
2.1. Têgegê Poyetîkayê.....	6
2.2. Peywendya Poyetîkayê Bi Zanstên Din Ve.....	8
2.2.1. Poyetîka Û Îstatîka	8
2.2.2. Poyetîka Û Zimanvanî.....	9
2.2.3. Poyetîka û Rewanbêjî.....	9
2.2.4. Poyetîka Û Sîmolojya.....	11
3. POYETÎKA DI HOZANÊN SEBIRÎ BOTANÎ DA	13
3.1 ZIMANÊ HOZANÊ	13
3.1.1. Girngya Zimanê Hozanê.....	13
3.1.2. Pênasa zimanê hozanê	15
3.2. Zimanê Hozana Sebrî Botanî.....	16
3.2.1. Ladanên Zimanî.....	17
3.2.1.1. Ladanên Fonolojî.....	18
3.2.1.2. Ladanên Fonolojî.....	20
3.2.1.3. Ladanên Sîntaksî	22
3.2.1.4. Ladanên Sîmantîkî.....	25
3.3. PEYV Û ZARAVÊN GELÊRÎ DÎ HOZANA SEBRÎ BOTANÎ DA	27
3.4. WÊNÊ HOZANÊ	30
3.4.1. Giringî ya Wênê Hozanê	30
3.4.2. Têgeh û Pênase yên Wênê Hozanê.....	31
3.4.3. Wêne Di Hozanên Kevin Û Nû Da	33
3.4.4. Corên Wênê Hozanê.....	35
3.4.4.1. Dabeş Bûna Wêney Ji Alyê Avahiyêve.....	36

3.4.4.1.1.	Wênê Sade (Tak)	36
3.4.4.1.2.	Wênê Lêkday (Aloz)	37
3.4.4.1.3.	Wênê Bi Hevrayî	39
3.4.4.2.	Dabeş Bûna Wêney Ji Alyê Bizavêve	41
3.4.4.2.1.	Wênê cêgîr.....	41
3.4.4.2.2.	Wênê livok.....	Error! Bookmark not defined.
Çavkanî		Error! Bookmark not defined.
ENCAM.....		50



PÊŞGOTIN

Edebiyata nû ya Kurdî mîna deryayeka berfirhe ku tijî guher û mirwariyên giranbiha ne. Her kesê ku di wê riyê de dimeşe, tiştên nû û taze bi dest dixê. Ji ber vê yekê jî edebiyata Nû ya Kurdî di hemî deman de pêwîstî bi xebat û lêkolînê heye. SEBIRÎ Botanî mîna gewhereka di nav wê deryayê de ye. Herwesa navê wî di nav civeta Kurda û Edebiyata Kurdî de mîna sitêrkeka geş diyare. Em jî di vê xebata xwe da li ser helbestên helbestvanê hêja yê ku di Edebiyata Kurdî ya nû da û di nav hemû Kurdan da tê naskirin û li ser nivîskarê vê yê navdar SEBIRÎ Botanî rawestiyane. Xebata me bi piranî li ser mijarê Poyetîkayê ye, me di xebata xwe de helbestên SEBIRÎ Botanî ji aliyê mijarê ve şîrove kirine.

Mebesta vê tezê " POYETÎKA DI HOZANÊN SEBIRÎ BOTANÎ DA" ew e ku heta niho çî vekolîneke akademîk derbarê şîrovekirin û hilsengandina helbestên Botanî da nehatiye amadekirin, dîsa mîna pêdivî helbesta wî ji aliyê Poyetîkayêve nehatîne şîrovekirin. Tenê li ser berhema wî çend vekolîneka kêma hene. Ji ber vê armancê ev e bûye xaleka giring ku ev vekolîn bi rengekî berfireh bihête encamdan.

Ev vekolîne ji despêk û sê beşan pêk hatiye: Di despêka de, em li ser hemû qonaxên jiyana SEBIRÎ Botanî sekinîne. Me cih daye cihê jidayîkbûna wî û herwiha em li ser perwerde û xwendina wî jî rawestiyane. Digel vê me peyvê Poyetîkayê û peywendiya wê bi zanistên din ve şîrove kiriye. Beşa yekemîn derheqê jiyana wî û berhem û serborên wî ye. Di beşa duyemîn de em li ser Peyvê Poyetîkayê û peywendiya wê bi zanistên din ve rawestiyane. Di beşa sêyemîn de bi piranî em li ser poyetîka di hozanên Sebirî BOTANÎ de rawestiyane.

Ji bo encamdana vê vekolînê û gehîştin bi xalên dest nîşankirî yê vekolînê ya pêdivî bû ji aliyê tiyorî û piraktîkî ve ku bihête diyarkirin, lê me pitir sûd ji rêbaza şîrovekariyê wergirtiye.

Nahê veşartin ku di cêbecêkirina vê pêkulyê da gelek asteng hene. Girngtirîn astengên di rêya van curê vekolînan de, kêmbûna jêderk û çavkaniyan, bêguman amadekirina vekolînek wesa ne hêsa bû. Lewra li ber destê me tu xebateke bi vî awayî rêkûpêk tunebû. Dîsa jî ew jêder û çavkaniyên ku me bikaranîne û mifa jê hatiye wergirtin. Hemî bi tîpên "Erebî" bûne, tezê me jî bi tîpên "latînî" ye, ji ber wê yekê tîpên latînî astengeka din bû di riya me de.

Jî di amadekirina vê tezê de şîret û asankariyên şewirmendê min Doç. Dr. Vecihî SONMEZ û serok beşê min Doçentê alîkar Nesim SÖNMEZ arîkariya wan cihê rêzê ne. Her wiha ji bo ku di warê metodolojî û serastkirinê de alîkariya min kir.

Herî dawî, ez spasiya hevser, malbat, xwuşîk û birayên xwe jî dikim.

Piştî van hemû pêngavan, encamên vekolerê bi regekî kurt û puxt bi çend xalan hatîne rêz kirin. Hêvîdar im ev vekolîn bibête rêxoşkirnek bo karên mezintir û berfirehtir.

Hareem H. Sulaiman

Wan -2017



KURTEBÊJE

amd: Amadekar

B: Berg

Bnr: Binêre

Ç: Çap

H: Teqwîma Hîcrî

b.n.b: berhema nav borî

H.r: Heman rûpel

Hwd : Her mîna din

J: Jimar

S: Sehîfe

C: Cild

P.X: Pirtûka Xalid Sadî

Ko: Kovar

M: Teqwîma Mîladî

Nd: Nivîskarên din

R: Rûper

S.x.l: Silava Xwedê Lê be

Wer: Werger

Weş: Weşanger/Weşanxane

B.M: Berî Mîladî

1. JYANA KESÎ Û WÊJEYÎ YA SEBIRÎ BOTANÎ

Navê wî (Sebirî Ehmed Temere), li sala (1925)ê li gundê (Ludê) ser bi bajêrê (Erhê)ve li wîlayeta (Sîrtê) li herêma (Botan) hetve cîhanê. Jyê wî (8) sal bû demê bi binemala xwe ji BOTANê çûne (Binxetê) li başûrê rojavayê.¹

Li sala (1936) ê li mizgefta (Mezarjêrî) deşta hesnan dest bi xandna (Elf û bê) kirye, piştî hîngê çuye gundê (Çelo), ji wêrê çuye (Zxatê). Li sala (1937)ê ji (Zxatê) çuye (Sêgirka) li ber destê melayê wêrê quran bi nivî kir û paşî çû mala pismamekê babê xwe li (Îndewêrê) da xandina xwe ya dibistanê bixwîne. Herçende ji xwendekarên êkê bû, lê jiber nebûna pertûk û qelem û defteran nikarî xwandina xwe temam bike. Nexasime mala mamê wî ji (Îndewêrê) çû şamê, jiber hindê neçar bû li (Dêrkaheku) rêza çarê bixwîne.

Dîsan li wêrê nema, li dumahyê naçar bû xwendina xwe bihêle û êdî nekarî bixwîne, lê ji biçukatyê ew evîndarê xwandinê bû lewra karî hêdî hêdî xwe werar bike û bibît rewşenbîrekê gelek baş. Anku BTANÎ li dû cihan (Xandingeh û Mizgeftê) xwandye.²

BOTANÎ heta jiyê (19) salî li cihê xwe maye û li dûmahya sala (1943)yê yan li despêka sala (1944)ê ra bi binemala xwera hatye Îraqê û li bajêrê (Zaxo) akincî bûn. Lê jiber derbederyê û nebûna çavkanyên jyanê dîsan bi hejarî dijîn. Demê jiyê wî gehştîye (20) salan ye çû bajêrê (Muslê) li wêrê li ser hêla tîrenê kardikir.³

BOTANÎ piştî ji bajêrê (Muslê) vegeryave ji bo bajêrê zaxu nêzîkî sala (1946)ê jin îname, jina BOTANÎ her dotmame wye. BOTANÎ çenid kurek hebûn, navên wan (Kosret, Nesiredîn, Nizar, Beşîr, Minîr, Şêrko, Kawe)⁴

Li sala (1975)ê BOTANÎ ji bajêrê (Zaxo) dûkanek vekir, jiyara xwe bi wê çendê birêve dibir.⁵

¹ Weşanên Êketya Nivîserên Kurdistan-Dihok, *Dîwanên Botanî (Şîn û Şayî, Dilstan, Bilura Çîyan, Ç1, Çapxana Hawar, Dihok., 2008, R.179.*

² Umer Bnr, Fazil, *Torevanêd Xwe Binasin*, Kovara Dengê Me, J3, Çapxana El-Hewadis, Bexda, 1984, R.6.

³ Weşanên Êketya Nivîserên Kurdistan-Dihok, *Dîwanên Botanî (Şîn û Şayî, Dilstan, Bilura Çîyan, R.179.*

⁴ Sebirî Botanî, *Şîn û Şayî, Ç1, Çapxana El-Edîb El-Bexdadye, Bexda., 1979, R.6.*

⁵ Hemdye Hesên Mihemed, *Layê Hunerî û Naveroka Hozana (Sebrî Botanî)*, Nameya Masterê, Zanîngeha Dihokê, 2009, R.4.

BOTANÎ li bêzîkî salên hefitêyan mala xwe ji bajêrê (Zaxo) barkir û çû bajêrê (Bexdadê) û li wêrê akincî dibe û bi (Ebu Ezîz) yê bernyas bû, li wêrê bi karê rojnamevanyê radibe û li ser vî karî berdewam dibe.⁶

Li sala (1991)ê BOTANÎ bajêrê (Bexdadê) bicih hêla û hate bajêrê dihokê û di wêrê ra derbazî tirkyê bû û liber siruserma deşta (Slupyan) li bin çadirekê jyaye.⁷

Digel vê çendê BOTANÎ hîvî dikir ku vegere bajêrê (Zaxo/Îraqê) û weke berê li nav ture û turevan û doststan dîwanê germ ket. Lê destkurtyê û delîve tenigyê rê lê girtye.⁸

Demê BOTANÎ li deşta silopyan û li jêr kawdanên nexweş û bertenigên wêrê barê wî yê saxlemî têkçw û gelekê nexweş bû. Di encamda BOTANÎ kete di nexweşxana Dyarbekrê da. Li roja 23/11/1991ê jiber ku leşê wî rexê rastê şelelê girtbû, piştî ji nexweşxanê derketî careka din vegera jêr çadirên kempa silopyan.⁹

Li sala (1992)ê BOTANÎ ji nav çadirên kempa slopyan derket û bi êcarî welat bich hêla û gehîşte welatê (Nerwîc)ê deme gehîştîye wêrê gelek yê lawaz û westay bû ji encamê şelelê, heta ku nujdarî gûte hevjinâ wî eger nehatba da mirîf. Lê piştî demekê barê BOTANÎ yê saxlemî baştir lêhat.¹⁰

Her bi vî away li bajêrê (Oslo) û li welatê nerwîcê li demjimêr nehî spêdehya rêkeftê 25/10/1998ê dile mezinê evî hozanvanê ji lêdanê sekina.¹¹

Sebirî BOTANÎ her ji zarokînya xwe hez ji hozan û awaz û sitrana dikir, hêdî hêdî têkelya wî digel hozanê bêhtir lê dihat, hêdî hêdî xwe dît yê hozanan dînvîse. Hozana êkê ku ewî nivêsyê (*Lezke Bi Lezîne*) li sala (1946)ê nivîsyê.

Lezke bi lezîne ey qelem

Gelek borîne sal û dem

Ev jîna derdi tehil û derd û xem

⁶ Hemdye Hesên Mihemed, Layê *Hunerî û Naveroka Hozana (Sebrî Botanî)*, R.4.

⁷ Hemdye Hesên Mihemed, Layê *Hunerî û Naveroka Hozana (Sebrî Botanî)*, R.4.

⁸ Sebirî Botanî, *Şîn û Şayî*, R.6.

⁹ Hemdye Hesên Mihemed, Layê *Hunerî û Naveroka Hozana (Sebrî Botanî)*, R.4.

¹⁰ Hemdye Hesên Mihemed, Layê *Hunerî û Naveroka Hozana (Sebrî Botanî)*, R.5.

¹¹ Îzêt Fendî, *Dilstana Xwe Bernadem*, Rojname Botan, J 5, Çirya Duwê 1991'de, R5.

*Li dil dijenin sed kelem*¹²

Di rastî da Sebrî BOTANÎ li sala (1944)ê dest bi hozan vehandîne kirye, lê demê ji sala (1946)ê li bajêrê Musil hatye girtin destpêka hozan vehandinê bû.

Ew hozan ewên di navbera wan salanda nivêsiîne nehatîne nivêsiîn û hilgirtin, ji ber hindê jimara hozanên wî ji (1946)ê heta (1957)ê ji bîst û pênc heta ku sîh parçe hozanên kurt bû, paşî wana dest bi nivîsana wan kir, ewên li sala (1946 - 1957)ê hatbûn nivêsiîn, lê ji sê parçan zêdetir li bîra wî nemabûn. Lewra neçar bûye ew parçên mayî ji devê hevalên xwe ewên hozanên wî jiber dikirn wergirît û binvîsît.¹³

Bi heman şêwe jî dinavera van her dû salanda careka din berhemên wî rastî berzebûnê bûne û nemanê bûne, çunkî ew digel chên cûda geryaye. Her bo nimûne li sala (1965)ê Sebrî BOTANÎ li gundê (Qere Hesên) ewê dikevîte başûrê Kerkukê vemaye, paşî li devera Zaxo bû, li wî demê ewî şeş parçeyên hozanê digel hindekên dijî di deftereka biçîk ra nivêsiîn, lê piştî mawekê ew defter nemabû, çunkî ew dinavbera her dû deveran dihat û diçû, di gelek gûnd û mala n dima û ewî nedizanî ka ew defter bi dirstî li kêrê maye.¹⁴

Bi vê çendê Sebrî BOTANÎ dibe xwendekarekê praktîkî yê rewşenbîr, çunkî bi dirêjahya jyana xwe li gelek cihan yê geryaye, welat ji bo welat, bajêr ji bo bajêr, gunid ji bo gunid, li her cihekî ji bo demekî lê dima û li wî maweyda gelek tişit ji wan mîlletan çî ziman bît yan rêz û serûber bin ji enicamê têkelya wê digel jyara wanda di wertin.

BOTANÎ felsefeka rewşenbîrî hebû, ewî dizanî her şerekî çekê wî çye, peyv û axaftnên wî ew qas xweş û di şîrîn bûn çî civata ew lêba hemî di hewandin, di hevpeyvîna gelek yê rastbêj bû.¹⁵

Weke dibêje:

Gelo ev çenid sale

Jîna me tîj û tale?

¹² Îzêt Fendî, *Dilstana Xwe Bernadem*, R.4.

¹³ Hemdye Hesên Mihemed, Layê *Hunerî Û Naveroka Hozana (Sebrî Botanî)*, R.5.

¹⁴ Desteka Nivêseran, *Xeberekê Nexweş*, Rojnama Botan, J 5, Çirya Duwê 1991'de, R.12.

¹⁵ Hemdye Hesên Mihemed, Layê *Hunerî Û Naveroka Hozana (Sebrî Botanî)*, R.6.

Eviro tu bîr belavî

Lewra di benid û davî¹⁶

Ji vê çenidê xuya dibe ku BOTANÎ rewşenbîrek xudan jyaneka dijwar û nexweş bû, lewra her gav yê jê nerazîbû, jiber hindê pitrya berhemên wî rexne û gazinde bûn. Mebesta wî ji wê çendê rasişkîrîna karê şaş û nerewa bû.

Sebirî BOTANÎ ne bi tinê bi hozanvanên kevin karîger bûye belkî hozanvanên nû jî kartêkirin li ser wî hebû, di heman demda derçûyê xwandîngeha govara Hawar bû.

BOTANÎ prnanya caran demên xwe bi xwandîne û nivêsinê di bûranid da ku şewazê nivêsinê xwe û şarezay ya xwe di warê tiwreyda bihêz bike, hergav şîret li gencan dikir bi taybetî ewên destê nivêsinê hey û di gutinê gelek bixwînîn û kêmbinwîsin da peşêman nebin.¹⁷

Sebirî BOTANÎ ji bo demekê dirêj xizmeteka here mezin bo pêşvebirna rewşa turey û rewşenbîrî kirye.

Gelek ji nvêsin û şilovekirnên wî di hinek rojname û kovarên kurdîda li Îraqê hetîne belavikîrîn. Hozanên wî di nav xelkîda bibûn sitran û ji layê sitranbêjan ve di civat û kafêyanda dihate gutin.¹⁸

Sebirî BOTANÎ di warê rojnamevanya erebî û kurdî da weke rojnamevan û nivêskar û wergêr karkirye. Ew ne ji kesên rêveber bû, belkî tinê nvêser bû, jiber wê çendê ew ji karê wî nederêxist û hêla ji cihê xwe, ewî careka dîn weke nivêser li rojnama (el-Îraq) bi taybet li (pşkoya Îraq) kardikir.¹⁹

BOTANÎ hijmareka mezin ji çîrokan di nav govar û rojnaman da belackirîne, bo nimûne dê navê hinek ji wan bêjîn wek (*Mi çira xwe vemirand û ya te berdayê, xewna çelenge koçer, bîranînek ji dîwana dayka gogîn, huştir di çîrokek efsaneyya kurdî de ji keşkola babetên (dibêjin) wergêraye, ji verêja cenga mezin...*), her dû

¹⁶ Desteka Nivêseran, *Sebirî Botanî Mişexit Bûneka Bê Dumahî Û Wexereka Sermedey*, Kovara Peyv, J 9, 1999, R2.

¹⁷ Desteka Nivêseran, *Çirayên Rewşenbîrya Kurdî Sebirî Botanî*, Kovara Peyv, J 9, 1999'de, R2.

¹⁸ Botanî, Sebirî, *Lexom Edwêm*, Rojnama Hawkarî, J1175, 1990, R8.

¹⁹ Sebirî Botanî, *Şîn Û Şayî*, R6.

çîrokên (Xewa Me, biçûkê negirît naxut) yê (Ebdulrehîm Rehmî Hekarî) ji govara jîn û ji latînyê wergêrayne. Herwesa çenid çîrokên wek (El-Rimane El-Hamize, Elbum...) ji zimanê kurdî wergêrayne ser zimanê kurdî.

BOTANÎ gelek ji berhem û hozanên xwe di (paşkoya Îraq)ê da belavdikrin, çunkî ev pişkeka taybet bû bi zimanê kurdî ve. Herwesa bi dirêjayya karê wî weke nivêser li çendîn rojnaman ji Bexdayê karkirye, weke (Îraq, Bizav, Hawkarî) BOTANÎ gelek ji berhemên xwe di nav van rojnaman ra belavkirîne.²⁰

Her wek xuya bwî BOTANÎ hinek ji berhemên xwe li dev hevalan dihêlan yan jî, lewra hijmareka mezin ji berhemên wî winda bûne.

BERHEMÊN SEBIRÎ BOTANÎ

1. *Dîwana Şîn û Şayî.*
2. *Dîwana Dilstan.*
3. *Dîwana Dengê Metîn û Cudî.*
4. *Dîwana Pahîz*
5. *Dîwana Çîrok û Çîvanok*
6. *Dîwana Bilura Çyan*
7. *Serhatî, Buyer û Bîranîn*, Ktêb bi xweji windane û nehatîne dîtin, lê gelek ji nivêsarên wî mane.
8. *Ji Dîmenên Cenga Mezin*, Roman.
9. *Sê Ktêb Li ser Gulbiharê.*
10. *Valburman*, Çenid hozanên hilbjartî ji kurdî ji bo Swêdî Hatîne wergêran.
11. *Ferhengok.*
12. *Gutar*, Hijmareka mezin ji gutaran li ser babetên cuda cuda yê hatîne belavkirin, hinek jî li dev kurê Beşîr mayne û gelekên din li dev çenid kovar û rojnameyên kurdî mane; heta niho jî nehatîne belavkirin.
13. *SÎ-DÎ (CD)ya Şivan Perwer*, dirêjayya wê 40 xûleke.²¹

²⁰ Sebirî Botanî, *Şîn û Şayî*, R6.

²¹ Hemdye Hesên Mihemed, *Layê Hunerî û Naveroka Hozana (Sebrî Botanî)*, R.17-20.

2. Hozanetî (poyetîka)

Poyetîka (Poetics) ku zaraveka kevin û nûye, Di despêkêda (Eristo) bikaranîye û her ew jî bi êkem kes dihête naskrin ku av zarave bikaranîbe.

Li serdemê Grîkîyanda mîna despêkek jibo yasa û bingehên Edeb û Hunerê, Me digehîne ve rastîyê ku (Poyetîka)ya Arstoyê ((*bi Êkem pertûk di vî bwarîda were naskirn û heta serdemê Rênîsansê girngya Poyetîkayê berdewam dibe*))²²

2.1. Têgegê Hozanetî (Poyetîkayê)

Dinav van ghorînên biser têgegê Poyetîkayêda hatîne bi şeweyekê giştî ji dû têgehyan pêktêt. Ya êka Arstoy bi ramana (Tyora Dahênanê) anî ziman, mebest ji vê têgehî jî dîtina bandorên taybetên her şewazekê hozanê û vekolîn li van regezên wataya pêkdînin, bingeha her karekê hozanê xuya diket ligur vê çendê ku lasayî kirn rewanya derbirîneye.

Ya duwê (Cakubiston) ev zarave anî ziman, bi vê ramanê ku peyameka zimanî dikete karekê hunerî û hunerê ziman, herwesa ji hunerên din cuda diket, yanjî vekolînaka zimanyê ji bo erkekê hozanê di çarçuvê axavtin û pîtedan bi vekolînên sîntakîsî û peywendîyê pêkgîhor di nav birganda anku ew tiştên girêday bi dahênanêve û çêkrda karekê, ku di êk demda ziman navk û alaveka wye.²³

Eger em li van herdû têgehyan binêrîn, di ya êka em dişeyn poyetîk bi yasayên gutara edebî xuya bikeyn ku dahênan ji wî ji dayk dibe. Ya dwê jî ji vê çenidê pêktêt ku têkistekê edebî ji têkistekê na edebî û têkistekê hozanê ji têkistekê na hozanê ji hev cuda bihêtekirn. (Todorov) poyetîkayê Eristoy bi vî rengî dînîte ziman û dibîje: “çend tiyorkin ku bi saxletên hinek corên gutarên edebîve girêdaye”²⁴

Paşî gelek tiyor û nerînên din derbarê têkstên edebî li têgehê poyetîkyê nêzîk bûn. Lê mîna van têgehştinên niha nebûn. Zaravê poyetîka anku bi fernsî (Lapoetique) ku dibe zaravekê kurdî bilez watayekê di fikra xwendevananda pêkdîne ku peywendîya wî bi hozanêvebe. Di rastîyêjîda arîşa poyetîka gelek berfirehtre. Bo êkem

²² Mehmud Ketunî, *El-Luxe Şi'rye, Dîrase Fî Şi'r Hemîd Se'id*, 1997, S19.

²³ Diz Semîr, *El-Neqid El-Erebî Ham Rewa El-Hedase*, S226.

²⁴ Hesên Nazim, *Mefahîm El-Şi'rye*, S24.

car li kulîja Dufrans (valêrî,1946) “ev zarave bi watayeka nû bikardîne û dibîte bingehêk ji bo tyora wêjey”²⁵

Ev têgehe wesa çûye di nav eqlê xwendevananda, ku peywendyeka bihêz bi hozanêbe, bûna vê peywendyê di nav janrekê din ya edebê daye ku tam û bona hozanê dide, çunkî çêdibe nek tine têksteka edebî (hozan, çîrok, roman...) belkî di axaftnên rojane jî da were dîtn. Bo nimûne: demê axavtinkerek derbirînên ciwan be, gûhdar hest bi tam û xweşyeka taybet dike û di şyandaye poyetîkayê di navda were dîtin.

Di romanekêda pişkek were dîtin ku poyetîka têdabit, anku dibêjne kesekî ev poyetîkaya ciwan çîye! Hemî ew derbirîn di asta mîtafora zimanyê û ji livîn u bzavên dyarîkirîne û ev derbirîne ji zmanê hozan û yasayên wê nêzîk dibe²⁶

Eger em bi nêrîneka sad poyetîkayê bimeyzînîn, diçîte nav zimanê zaroyanda ku vyanê çêdike û hesta mirovî dilvîne û bê vê çendê têkist bi deqeka wêjyaya mirî were danan.²⁷

Poyetîka (Poetics) wek têgeh ev zarave bi gelek ramana hatye wergêran bo zimanê Arebî (*şî'ryet, el-şî'rye, darêtin, el-eînşaye, şa'yryet, el-şayrye, hunerê dahênanê an fen el-îbida', hunerê hozanê an fen el- şî'r, tyora hozanê an nezerye el-şî'r.*)²⁸ Fars jî zaraveyên (*Hozanvanî, Hunerê Hozanê, Hunerê Hozanvanî*) anye ziman.²⁹

Hinek ji van têgehyan peywendî bi rewanbêjyêve heye mîna darêtin û hinek din jî bi Şêwazên Adebî mîna (Hozanvanî), yê din jî bi pîvanên edebî grêdaine. Herwesa di nav kurdajî da (Poyetîka) gelek hatye bikarînan.

Nasandina Poyetîkayê tine dinav van dû têgehanda nahête zelalkirin, dibe digel çenid zanstên edebîyên din çend alyekê van bînîne ber çav, mîna zanstên (zimanvanî, rewanbêjî, şêwazgerî, îstatîka), çunku her zanistek peywendyeka erênî digel (Poyetîka)yê hene, divêt bhête behiskirin.

²⁵ Ehmed Mela, *Xeyalkirdinî Wênay Ş'ri Ê Girftokanî Cîhanbînî*, R17.

²⁶ Ehmed Yusif Dawid, *El-Neqid El-Şî'r*, S16.

²⁷ Dr. Hesên Mihemed Nuredîn, *Şî'rye We El-Qanun Şî'r*, S12.

²⁸ Hesên Nazim, *Mefahîm El-Şî'rye*, S18.

²⁹ Babil Ehmedî, *Saxtar We Tewîl Misn*, S79.

2.2. Peywendya Hozanetî (Poyetîka) yê Bi Zanstên Din Ve

2.2.1. Hozanetî (Poyetîka) Û Îstatîka

Didemekîda ku zanstê îstatîkayê çûye nav têkstekê wêjeyî, ji alyê erkîve ji Poyetîkayê nêzik dibe û kartêkîrn li hevdû diken û pêkulyê diken giwtran bike giwtên edebî. Alyên ciwankarî û îstatîkayê bi xaleka serekya van guhrînan were danan, çunkî îstatîka bi xwe (êke ji sinbulên poyetîkayê)³⁰ Eve rêjeyeke û em dişeyn bêjîn îstatîka di nav edebêda pleyê poyetîkayê zêde dike, (Poyetîka di hemî ew huneranda heye ku îstatîkayê balkişanyê ser)³¹ jiber wê yeke îstatîka û poyetîka peywendî bi hevdû hene.

Eger em ji alyê têgehê poyetîkayêve binêrîn, poyetîka ji îstatîka bi xwe geşê kirye. Ku ji alyê (Cakubson- Rêbaza Prag) hatye bikarînan, di demekîda ku îstatîkayê siruştêka mîtazmanî heye.

Cakubson bi renekê wesa poyetîka bikarînan ku dinav hozananda nehête zîndanîkîrn û balbikşînîte ser hunerên din jî, herçende dinav hozananda zêdetir were bikarînan.³² Îstatîka digel zanstên din têkelya têkisteka wêjeyî diken û poyetîkayê çêdiken û dibne pîverek ji bo ji hev cudakirna têkisteka wêjeyî ji têkisteka nawêjeyî û pleyên bihêz u bêhêzya vî wêjeyî nişan didet. Jiber hinde îstatîka û poyetîka têkistan nemir dike, astê helbestekê ji êka din cwda dike.

Ji alyê saxletanve tekistakên wêjeyî ji tekistakên nawêjeyî cuda dike, poyetîka ji biçîktirîn yekeyên derbrînê destpêdike, ((*derbirîn*)³³ *ku peywendyeka bihêz bi têgehên ciwannasyêve heye*)³⁴ û dibîte sedemek ji bo peywendyên bingehyên zimanê derbirînê digel îstatîkayê ji alyekîve û poyetîkayê ji alyekê din ve.

Poyetîka ne tinê ji bo hozanêye, belkî hemî gûtarên wêjeyî vedigrît. Armanca vî jêgirtina wê pirsyarêye ku hemî vekolîneka wêjeyî bi cudahya rebazên wan dînîte ziman. Ewjî çî tişit wediket gutareka wêjeyî digel erkekê îstatîkî bandorê li ser têkstekê wêjeyî çeken.³⁵

³⁰ Mihêdîn Sibhî, *Nezerye El-Neqid El Erebi We Tetewirha Îla Enasir*, S32.

³¹ Dr. Hesen Mihemed Nuredîn, *El- Şi'rye We El-Qanun El- Şi'r*, S12

³² Tahir Mistefa Elî, *Şi'rye El-Islub El-Rewawî Fî Xetab Mehmud El-Birîkan*, S16:

³³ Mêtafor, Xiwaze, Te'bîr.

³⁴ Mîkayl We Bixasîr, *M'ayr Tehlîl El-Islub*, S31.

³⁵ Şi'rye El-Xetab El-Edebî, *Ferîde Mulî*, S44

2.2.2. Hozanetî (Poyetîka) Û Zimanvanî

Zimanvanî di nav Poyetîkayêda roleka here mezin dîtye, çunkî berî wê çendê ku Poyetîka wek yasayên dahênanê bhête, ziman dinav hozananda rola xoya sade dîtye, lê bo zêdetir karkirn li bingehê deqîda giranya wê dkevîte ser zimanî û dişet hemî erken xwe bixwve bigrît. Poyetîka û Zimanvanî jî pşta xwe bi zmanive grêdiden.

Ciwankirn û derêxistna wişê û destewaje paşî riste û deq ji encama amadebûna zimanvanyê, poyetîka mîna demarkeye ku binav zimanvanîda derbaz dibe, di vêreda peywendiyên poyetîka û li astekêdaye ku erken wan ji hevdu nîzîk dibe.

Çewanya serederî kirna nivîskarî digel ziman û corê têkelbûna rehendên poyetîka û îstatîkîyê têkstê were gorîn, bi watayeka din deme ku nivîskar bi şewazên bilind yarî bi keresteyên zimanî dike arasteya poyetîka berev bilind bûnêve diçe, çunkî ev zimane poyetîkayê çêdike nek naverok û îhsasê nivîserî. Eger hemî jî çarçuvê naverokê neçne ji derve poyetîka tama têkistekî ji têkistekê din zêdetir û îstatîkayê derbirînê bihêz diket. Eve jî peywendiyekê neveqetyaye kû poyetîka dikevîte nav zimanewanyê û îstatîkayê.

Ezîz GERDÎ nivîskarê maznê kurd dibêje; “pyetîka di nav peyvê bi xweda tûneye û ev peyve xwe ji peyvên din cuda naket bi wê êka ku eve poyetîka têdaye û yê dîtr na, belkî pesindî û ciwanî û poyetîkayê peyvan di wataya xwe ya kîr daye”³⁶

Bi watayeka din peyv hêz û pandorê wê tûneye eger dormandorên wê dinav têkistanda yê guncay nebe (anku bikarînan peyvan û çewanya damezrandina wê bihayê peyvê dyardike û dikete peyveka hozanê û eve jî ne wêjeka serbixweye, di heman peyvda rengvedide)³⁷

2.2.3. Hozanetî (Poyetîk)a û Rewanbêjî

Eristo rewanbêjî ji poyetîkayê cudakir, bi renekê serederî digel rewanbêjyê kir ku hunerê şyana razîkîrn û bawerîye mîna hunerê zarvekîrnê u niwandînê serederî digel poyetîkayê kir.³⁸

³⁶ Ezîz Gerdî, *Edeb Û Rexne*, Ç1, R61

³⁷ Ezîz Gerdî, *Edeb Û Rexne*, Ç1, R62.

³⁸ Conasan Karil, *Nezerîye El-Edebye*, S85.

Lê hinek zaraveyên rewanbêjyê mîna pişkek fer li bingehe têkstên hozanê îstatîka û şêwazgeryê were pîvan, mîna (mîtafor û xwastin). Poyetîka jî ji derveyê van yasayane ku bi nerîneka giştî li têgehê hozanên prensîpî vekolînê dike, (dûrhêlên wêneyî û xeyalî û îstatîkî û ciwankaryên nav deqî, pêkhatyên êk alîkerin ji bo dyarîkirna taybetmendiyên poyetîka)³⁹

Anku poyetîka şeweyekê zimanî wêjeyê û derbirînxwaz jî saxletên berhemê poyetîkayê û dinav xwe da digel bingehe zimanî tekel bûye. Rewanbêjî ji riwanga zimanî ve bandorê liser rewankirn û bihêz kirna bihayê derbirîne dike. Jiber vê çendê di nav rewanbêjyê û Poyetîkayêda heverkyek were dîtin hemî ew nerîn û boçûne bûne sedemê wê çendê ku rewanbêjî cihê poyetîkayê bigre.

Armanca poyetîkayê bi giştî vedîtina bingehe veşartye di gûtara wêjey da anku navka wêjeyê.⁴⁰

Rewanbêjî mîna zanistekê ji peywendiyên nav têkistan vekolînê dike û di heman demda digel zimanî peywendî girê didet, vêca têkstê deqekê hozanê bit, girng karlêkirna wye digel ziman û pêkhatên wê, çunku rewanbêjî bi giştî bi zimanîve ye girêdaye û ew jî di hemî janran hevpişke mîna wê çendê di nav dêrên hozanê da heye.⁴¹

Pişkek ji rewanbêjyê diçe di warê ladanê ku ladaneka zimanî be, Yan watayî, çunkî ev ladane ji şêwaz û axaftina ya asayî rewanbêjyê çêdike û bihayê deqî bilnd dike û poyetîka jî çêdike. Jiber hindê eger rewanbêjya kevin erke wî tinê îstatîkaya derbirîne bû di çarçuvê hinek yasayên danay da. Li sedê bîstem careka dî berg bo rewanbêjyê hatye kirn. Jiber hindê rewanbêjya kevin nikare hemî wêneyên cuda di bingeheka hevpişk kom bike. Ewê ku wana kom dike poyetîkaye. Jiber hindê peywendyeka hevpişk dinavbera poyetîkayê û rewanbêjyêda hene.

³⁹ Dr. Selah Fezil, Esalîb El-Şi'rye El-Masire, S85.

⁴⁰ Hesên El-Bena Îzedîn, El-Şi'rye We El-Seqafe, S53.

⁴¹ Ehmâd Mihemed, Sinaîye El-Şi'r We El-Nesir Fî El-Fikir El-Neqidî, S34.

2.2.4. Hozanetî (Poyetîk)a Û Sîmolojya

Sîmolojya dibîte sedemek ji bo nasandina têgehê poyetîkayê, çunku eger edebiyat bi watayeka giştî û berfreh jihê poyetîkayê bigre dê (pênasê edebiyatê ligor tyora sîmolojya wêjey cudakirna têkstekê wêjeyê ji nawêjeyî.)⁴² li gor vê çendê herdû têgehên poyetîkayê û edebiyat pîverekê edebî wana didete naskir, ji vê nerînêve destur û erken xwe destnîşan dike. Doza ziman û ladan ji astê wataya wê çewa bingehê pêkhateya poyetîkayêne di heman demda livînerê zanstê sîmîlojyayêne û ji rwanga hemî keristan amadeyya landanê hene û dikarin şêwazekê hunerî werbigirn (çêdîbe hemî deqek bo çend yekeyên hunerî were şrovekirin)⁴³

Hemî ew peywendyên hatîne behiskirin peywendyên poyetîkayê bûn digel hinek têgehên din di çarçuva bingehên di navda, mîna şêwaz û keresteyên pêkînanana têkstekê wêjey. Pêtivye peywendyên poyetîkayê bi astê jidervey têkstekê nehête pişgûhavêtin, çunku ne tinê ziman û pêkhata wê nabîte babet ji bo poyetîkayê (*ew tiştê ku poyetîkayê û hozanê ji pênasekirne da cuda dike ew Peywendya rehayê (mutlaq) ku poyetîka digel wergirêda heye*)⁴⁴

Pêwerê zîndya têkstekê û dahênanê nivîskarê di asayî bûna peywendyê dinavbera wergir û têkstekê daye, bi watayeka din vedîtna poyetîkayê ji def xwandevanî ji kesekê bo êka din were gihorîn, lê em dikarin bi vî rengî bideyne naskirin ku poyetîka taybete bi têgehê darêtina ciwan ku şyanê rakêşana wergirî hebe.⁴⁵

Nihênya poyetîkayê di vê çendê daye ku hozanvan yan nêvîserê têkistê bi hişyarîve peyvan bikardîne bi xwe hest dike poyetîka ji cihekê ji bo cihekê din bilindbûn û hatîne xwarê dike

Eve ji bo wergir yan rexinegirî jî di vê çarçuvê da xwe dibine ku bi hişyarîve serederyê digel têkistêda biket û bikare regezên hûneryên poyetîkayê têda vebîne, poyetîka ji deqekê ji bo êka din ji gihorînê daye û (*çênabe têkistek %100 poyetîka têdabe*)⁴⁶

⁴² Mifahîm El-Şî'r, Hesari Nazîm, S36.

⁴³ El-Şî'r El-Înzah, *Emîme El-Rewasîde*, S58

⁴⁴ Zana Xelîl, *Şî'ryet Le Dwa Weswesey Kirîstî Kazzakîsda*, R198.

⁴⁵ Dr. Enîf El-Behînsî, *Îlim Cemal We Qerat El-Nes El Fennî*, S188.

⁴⁶ Can Kuynar, *Bina Lixe El Şî'r*, Terceme: Dr. Ehmed Derwîş, S 32.

Poyetîka tinê kêş û serwa û yasayên kevn û serveserveyên hozanê nîne, belkî peywendyên dinavbera lînkên peyv û risteyên dinav hozananada vedigire.

Helbet hozan digel hinek bingehan yê girêdaye, mîna muzîk û kêş, lê ritim û peywendyên awazî bi wataya vê û hêza bi karlêkerê peyvên û wêney xeyal û sîmbul û regez û cwankarya watanasî û rewanbêjyê hemî pêkve têkistê dikene hozan.

(Poyetîka îhsaseka zimanya bilind û kîrbûneka mezine, hozanvan nikare dahênanê di zimanîda bike heta bi dirûstî îhsasê pêneke, ew îhsas jî derêxstna nav wişe û tîpane, ziman jî di bin destê hozanvanî da pêlan çêdike û dizêt û çewa were bikarhînan di vêda îhsas bi nhênyên dike, ku çavkanya behire û poetîkayêye)⁴⁷

Di van nerînên me behiskirî em dikarîn bêjîn ku poyetîka ji mêje derketye, lê bi şêweyekê sade xwe di nav têkistên edebî ra dyarkirye, paşî li gorî gorî û pêşveçûnên wêjey peywendî girêdaye.

Her hozanvanek xudan kesayetî û şêwazekê turey yê taybete demê em dibêjim avî hozanvanî şêwazekê turey yê bihêz û bandorê çêdike, anku ew şyaye her sê binemayên hunerî yên pêkhatina şêwazê turey mîna (fikir, hest û soz û aşup) bi rengê guncayî û rêxistî bikar bîne.

Her hozanvanekê şareza û jêhatî dikare zimanekê hozanê yê zindî u nemir ji behremendî û şyanên xwe yên bê sinûr bi afrînit û dahênanê têda bike, çunkî hêzên dahênanê ji dev hozanvanî pişt bi hinek behireyan grêdide.

⁴⁷ Nazik Melayke, *E'mal El-Nesiye El-Kamile*, R323.

3. HOZANETÎ (POYETÎK)A DI HOZANÊN SEBIRÎ BOTANÎ DA

3.1 ZIMANÊ HOZANÊ

(Ziman li dev xelkî tişteke giştî yê jyana rojaneye, her ji despêka peydabûna xwe da weke hoyekê têgehiştinê digel hevdû bikarîname, lê ziman di hozanê da siruştêkê taybet werdigire û erkê hozanvanî ewe evî zimanî di şewekê giştîda ji bo rengêkê taybetî bilnid biket, anku bi rêka dîtnê behremendî ya xwe di bandortirîn şeweyda rêkdêxît û hindî bikaribe zimanekê taybet ava ket, dê dahênana wî pitir derkeve)⁴⁸

Ziman kerestekê pêşkeftî û nûkere, hindî jyana me di pêşkeftin û nûkirinê da be, nûkirin û pêşkeftin lêkdaneke di jyanê da û derbirîna hozanê jî her weku hatîye gutin (*hozan pişkeke ji kawdanên derûnî hest û sozan û dapêşeka bandorê û hestpêkirnê û şepirzeyêye, ciwanî ya zimanî di hozanê da bû sîstemê (mufredata)û peywendyên wan digel hevdû vedigerît û evî sîstemî yasayên rêzmanî kontirolê li ser naken, belkî bandor û serbor kontirolê li ser diken, jiber hindê zimanê hozanê zimanekê mijdarîye*)⁴⁹

Hozanvan di darêtina hozanê da bi çî renga pêgirîyê bi yasayên rêzmanî yê zimanî nake, belkî li gor pêtvî yê helwêstî û heçûnê dêrîn hozanê rêkdêxît û destkarî yê di yasayên rêzmanî ra dike.

3.1.1. Girngya Zimanê Hozanê

Eger zimanê ji dev xelkî hoyekê derbirînê û têgehiştinê û pêkghora nerîname dinavbera mrovan da be, ji dev hozanvanî rengêkê dine ji derbirînê sîma û saxletên xwe hene.

Anku zimanê hozanê peywendî bi zimanê poyetîkayê ve hene, ji zimanê normal dihête cudakirin û xwe ji sadeyyê û sivikyê azad dike, kontirola hozanvanî bi ser zimanêda û guncandina zimanî û 'eqilî û aşûbê bi rengêkê digel naveroka hozanê harmonyeta çêdike. Em dikarin bêjîn çend xeslet û ciyawazî di nav hozanêda hene ji

⁴⁸ Dr. Edinan Husên El-'Ewadî, *Lixe El-Şî' Rye Fî El-'Êraq Beyne Mtle' El-Qerin El-'Eşrin We El-Herib El-Alemye El-Sanye*, Menşurat Wezare El-Saqafe We El-Î'alem, Sisile Dirasat (375), Dar El Hurîye Litiba'e, Bexdad, 1985, S9.

⁴⁹ Dr. Ibrahim El-Samerayî, *Lixe El-Şî'r Beyne Cilîn*, Dar El-Saqafe We El-Neşir We El-Tewzi', Beirut, Sene (?)S138.

zimanê zanstî û asayî dihête cudakirin.⁵⁰ Di vêreda dyar dibe zimanê hozanê ji zimanê asayî cudaye, çunkî ziman ji dev hozanvanî kerestê çêkirin û dahênanê.

(Zimanê nimûneye heta ku ji dev gelek ji wan hozanvanan jî ku peywendî bi durhêlîve heye, arezuya wan gihorîn û peywendyên wan yên rojane bi roja dumahyê ve wesa ji zimanê dike ku di peywendyên xwe yên rojane bi tenahî jîanê biburîne. Herwesa zimanê hozanê ne eşkirayyeka pêve dyare û digel lojik û dabeşkirin û sinûr ên wî neguncît)⁵¹

Zimanê hozanê pişkeke ji pêkhatina rûxsarê hozanê giringî û saxletên xwe di nav hozanêda ya hey, çunkî zimanê hozanê êke ji regezên bingehyên hozanê li ser bingehe hozanê, wêneyê hozanê tê avakirin, zimanê hozanê di nav regezên din yên di avahî yê hozanê da, core saxletekê taybet di dide û di heman demda deqê hozanê jî pêk dîne û ji zimanê asayê derbaz dibe û ji encamê ew guncandina di navbera peyvan û denganda hey cure awazekê taybet didete deqê hozanê.⁵²

Xuya dibe zimanê hozanê situyneka girng û sereke di avahyê hozanê da digel regezên dî mîna (Wêne, Kêş, Serwa) ji bo ragirtina avahyê hozanê kar diken. Anku eger xwandevanî şarezayyeka baş تمام di biyavê hozanê da nebe, nikare rêya xwe berev regezên din yên avahî yê hozanêve bike û bizane mebesta hozanvanî ji vê çenidê çye?

Ziman mîna sedemekê derbirîna turey her hozanvanek yê berpirsyare ji zimanê xwe yê hozanê, çunkî zimanê hozanê digel hozanvanî çî cara ji hevdu cuda nabin. Bi vê êkê hozan dikare peyama xwe bi rengekê ciwan û karîger û rêkxistî bigehîne xwandevanî, hozanvan bi hemî şyanên xwe bizavê ji bo bihêzkirin û cora û corkirina xwe yê hozanê dike.

Tiştêkê siruştîye binyatekê zimanvanî yê tak ji bo hozanvanî mîna derbirînek ji xesletên nerîna wî ji hember derûn û cîhana dormandorên wî bihête pêk înan. Hozanvan xebatê li se astê axaftina giştî ya berbelav ji bo xwe beşîna wî li jêr binyatekê zimanvanî yê hozanê di nav hozanêda dike.

⁵⁰ Ezîz Mehmud Pur, *Zimanî Pêwer û Zimanî Şî'ri Yan Marofîskî*, Govara Raman, Ji:80, Ji Weşanên Nawendî Roşnbîrî Gulan, 2003, R.58 – 59.

⁵¹ Dr. Ebdulla Yasîn Elî, *Honrawey Bergirî Le Berhemî Çenid Şa'îrêkî Kirmancî Seru Da (1939- 1970)*, Le Bilawkirawekanî Korî Zanyarî Kurd, Hewlêr, 2005, R.278.

⁵² Mihemed Xefur Mihemed, *Rêbazî Romansîzim Le Şî'ri Kurdîda 1918-1945*, Nama Masterê, Zanîngeha Selahedîn, Kolêjî Perwerde, Hewlêr, 2005, R.90.

3.1.2. Pênasa zimanê hozanê

Zimanê Hozanê sedemekê peywendîkîrnêye di navbera hozanvanî û xwandevanî da û bi rêya zimanî hozanvan dikare hest û sozên xwe bigehîne xwandevanî û di heman demda hizr û sernca wî ji bo cem xwe rabikêşe.

Dr. Muhsîn wteymiş dibêje (*Zimanê hozanê paşmawê hozanvanyê*)⁵³ ji vêre ra dyar dibe zimanê hozanê gelek yê girnge, çunkî dibe êk ji wan şûnwarên hozanvan û bi rêya wî zimanî xwandevan dikare hozanvanî çî şêwazên û rêbazên turey di berhemên xwe da pêrew kirye.

Tizftiyan Tuduruf dibêje (*Zimanê asayî bo veguhastina hizrekê, an hoşekê, an ji bo peywendîkîrnê di navbera mirovanda tê bikarînan, anku ji vêre ziman rêyeke, ne mebeste lê seniga zimanî di nav zimanî bi xwe ra heye, ew bi xwe mebeste bi vê êkê ziman yê serbixweye*)⁵⁴

Çêdibe hozanvan heman peyvên zimanê asayî bikar bîne, lê ew peyv hinek caran bi wataya xwe ya ferhengî dihêt. Hinek caran jî ji wataya ferhengî derbaz dibe, hozanvan ji bo mebesteka taybet di dilê xweda bikardîne, hosan peyv dê ji wataya xwe ya ferhengî dûr dibe, ji vê êkê xuya dibe (*zimanê turey ji zimanê asayî cudaye*)⁵⁵

⁵³ Mihemed Eles'ed, *Meqle Fî Ellixe Şi'rye*, Mekan Tebi' (?), Sene (?), S.69.

⁵⁴ Dr. Mihsin Etîmiş, *Dîr El Melayk*, T1, Wezare Elseqafe We El Î'lam, Bexdad, 1986, S18.

⁵⁵ Dr. Sasîn Sîmun 'Esaf, *Elsure Elş'rye We Nemazicha Fî Îbda' Ebî Newas*, T:1, Elmuesese Elcamî'e Lîdirasat We El Neşir We Eltewzî', Beirut, 1982, S.52.

3.2. Zimanê Hozana Sebrî Botanî

Sebirî BOTANÎ di nivêsinê da şêwazê asan û ne yê giran bikarînyayê û yê têda serkeftî bû û bi rengekê giştî zimanê BOTANÎ zimanekê sade û sivike û dûre ji aloz yê û giranyê hemî kes dikarin hozanên wî bixwînin û têbgehin, herwesa BOTANÎ hozanên xwe bi şêwazekê sade û sivik divehandin, daku hemî kes têbgehin û tam û xweşyê jê werbigrin, çunkî BOTANÎ digot (*Divêt nvêskar û helbestvan mîna çirayên geş bin, ronahiya xwe bidin hemî kesan çi mezin çi biçûk da çi kes ji wî berhemî bê behir nebe*)⁵⁶

Zimanê hozana BOTANÎ zimanekê sade û bi sanahî bû, çunkî ewî nedixast zimanê wî ji kesayetya wî cuda be, ka çewa ew kesekê civakî û girêdayê piraniya xelkê xwe bûye, wesa zimanê wî jî zimanekê gelêrî û zelal û zimanekê piraniya civakê wî bû.

BOTANÎ xudan zimanekê zengîn û sivik û bihêz bû, nivêsinên wî pirî ristên bi kurdyeka petî û zelal hatye nvêsin, belku kê hozanvan hene li ser demê wî yê niho jî bikarbin bi zimanekê wesa paqij û rehwan û xweş binvêsin û hozanên xwe pê divehînin.

Derbarê fêrkirna genc û xwendekaran ji bo nvêsinê bi zimanê kurdî, ewî bi xwe gotiye (*Şeş kes yê nenas û pir xwandevanên nedizanîn bi kurdî binvêsin jî bi şîreta min, xwe fêrkirin û wan jî hinek dî fêrkirin, hemî jî mîna li zanîngehê xandibin*)⁵⁷ mîna hozana (zimanê me) wek palderekîye ji bo xwandin û nivêsinêye:

Ya ji bo me pir qence

Nivêsinê kurdî merce

Xweş û nerm û şêrîne

Zimanê mem û zîne

⁵⁶ Tizfitayn Tuduruf, *Neqid El Neqid -Rwaye Te'elum-*, T: Dr. Samî Sudan, Mirace'e Lîlyan Suydan, T:2, Dar El Şûn Seqafye Elamme, Afaq Erebye, Bexdad, 1987, S34:

⁵⁷ Dr. Mihemed Bekir, *Kêş Ê Ritmî*, Şîrî Folklorî Kurdî, Dezgehê Aras, Wezaretî Perwerde, Hewlêr, 2004, R.25.

*Pê şîrîneken devên xwe*⁵⁸

BOTANÎ êk ji serkeftirîn xwandekarên hozanvan Ceger Xwîn ye, wî helbestên xwe bi zimanekê sivik û şîrîn û rehwan nvêsînê, di hozanên wî da derdê bindestyê, xweragirî û dilsozî û wefadarî, nefret ji xizinyê bi şêweyekê pir ciwan û sade were hatye derbirîn, jiber hindê jî bi sedan xelk hebûye ku helbestên wî jiberkirine.

3.2.1. Ladanên Zimanî

Bi rengekê giştî ziman her ji destpêka xwe bi çend binemayên wekî (Fonolojî, Morfolojî, Sîntaksî, Sîmantîkî) yê bernyas bû, her êk ji van binemayan saxlet û erkê xwe yê taybet ji bo pişkdarîkirin di pirosêsa darêtina zimanîda yê hey, bi borîna qonaxên cuda da pir giringî bi van binemayan hatye dan.

Dîsan giyanê huneryê hozanê di pêkhata zimanvanî ra veşartye, di dyarda şêwazgeryê da boyeka tamê ku serborên hozanvanî ji serborên kesên din cuda dike ya hey.

Di binyata zimanvanî yê zimanê hozanêda ev her çend binemaye tûşî dyarda ladanê dibin ev diyarde bi zimanê hunerîve ya taybete, anku bi rengekê ji siruştê xweve ji layê dahênerîve demê bi kiryara derbirînê radibe dihête dirustkirin, lê wergir yan xwandevan di her biyavekîda dê hest pêkirneka bihêz hest pêbîke bi vê êkê (*ladan rûyeke ji rûyên dyarda şêwazgeryê*)⁵⁹

Ji vêre em dikarin bêjîn ku dyarda ladanê serpêçyeka zimanyê, hozanvan destkariya sîstemê yasayên her çenid bingehên pêkhatina zimanvanîda dike, anku yasayên zimanî dişkîne û li gor mebesta xwe dirstke, çenid core ladanên zimanî dêxîte dinav hozanêda.

Piraktîkî wergirîn û ji layê van core ladanên li xwarê diyarkirî şilovekeyn:

⁵⁸ Xeyal Wel Îslub We Elhedase

⁵⁹ Norman Firîdman, *El Xeyal We El Îslub We Elhedase*, T: Cabir 'Sfur, T:1, Elmecilis Ele'la Lîl Seqafe El 'Amme, Mekân Tebi' (?), Sene Tebi'(?), S.205.

3.2.1.1.Ladanên Fonolojî

Li vêre vekolîn li ser (*dyarkirina erkê her dengê di zimanê da were kirin, di ladanên fonolojî da divêt sîstemê dengî yê zimanê bihêne destnîşankirin, çunkî her zimanekî yasayên fonolojî yê xwe yê taybet hene*)⁶⁰ ev çenide jî girêday zimanê hozanêye, çunkî hozan her gav berev peyva dengdar diçe.

Niho jî dê wan ladanên dengî berçavkeîn, ewên BOTANÎ di hozanên xweda kirî:

Felek nakit

Felek nadit

Nebye û nabit

Felek zemanê

*Bi vemanê.*⁶¹

Em dibînin hozanvanî di van dêran ra, dengê (e) ji herdû peyvên (*nakit*) û (*nadit*) gohartye, di dêra siyê da ji peyva (*nebiye*) dengê (û) jê birye, di heman dêr da ji peyva (*nabit*) dengê (î) hatye ladan.

Eger em ji parçeka din ya hozanê bimeyzînin, mîna

Ger ku ji bûna dilberê

Canê şîrîn bêtin dere

Ez bi te ra nabim heval

*Şêlo nakim 'ula zelal'*⁶²

⁶⁰ Dr. Usman Mewafî, Mwesese El Seqafe El Cami'e, Eskenderye, Sene (?), S.39.

⁶¹ Şewket Tahir Sindî, Mam Botanî Ji Bûna Te Ya Nû Silav û Silav, R142.

⁶² Bahoz Botanî, Ji Keşkola Şîn û Şadî, Rojnama Bizav, Ji:7, Bexda , 1989, R42.

Eşkiraye ku li vêre dengê (e) ji peyvên (ger) û (nabim) û (nakim) jê ladaye û di peyva (bêtin) da dengê (n) ji cihê dengê (e) were danan, dîsan di peyva (şêlo) dengê (o) ji şûna (î) were danan, herçende di van nimûneyên me behiskirî çenid ladan û gihorîn hatîne kirin, lê çî bandor nexistye ser wataya sereke nekiriye û sîma û saxleteka taybet bi xweve dîtye.

Bilbilo hinermendo

Bê zincîr û bê qeydo

Kacê bilorê bîne

*Xemên me pê birevîne*⁶³

Di dêra êkê da dengê (u) ji peyva (hinermendo) jê ladaye û di dêra siyê da di peyva (kacê) dengê (c) li cihê dengê (d) hatye ladan.

Dîsan parçeka din ji heman hozanê dê wergirîn:

Gazî bikim hey hewar

Kengê bêtin ew bihar

Xo helavêjim wek cara

*Linav gul û gulzar*⁶⁴

Ji vêre jî çenid ladanek ji layê hozanvanî ve hatîne kirin, di peyva (bikim) dengê (e) jê ladaye û di peyva (hewar) dengê (e) ji cihê (a) hatye danan û peyva (kengê) dengê (ê) ji cihê dengê (î) danaye û di peyva (bêtin) dengê (h) jê ladaye, ji pêşiya peyva (helavêjim) dengê (bi) jê ladaye û ji dûmahya peyva (cara) dengê (n) jê ladaye.

Dîsan di parçeka din ya hozanêda dibêje:

Reş siteme

⁶³ Dîwanên Serbirî Botanî (Şîn Ê Şadî, Dilstan, Bilura Çîyan) R190-189.

⁶⁴ Hemdye Hesên Mihemed, Layê *Hunerî Ê Naveroka Hozana (Sebrî Botanî)*, Nameya Masterê, Zanîngeha Dihokê, 2009, R.55.

Her ji kesê re nexeme..

Ev diyarin

Hin hişyarin

*Hin xemsarin*⁶⁵

Ji vêre jî çenid ladanên fonolojî hatîne kirin, di peyva (ev) dengê (e) jê ladaye û di peyva (hin) tîpên (dek) jê ladaye.

3.2.1.2.Ladanên Fonolojî

Mîna me berî niho behiskirî ku ladan di her astekê zimanê hozanêda dihête kirin, bi wataya hindê dihêt ku hozanvan destur û yasayên zimanî yên taybet bi xwe ve hene ji bo bichînana merem û mebestên xwe yên taybet.

Eve hemî ji encamê bikarînan hozanvanî bo kereste û bêje yên zimanî, belkî ji wataya wan hest û sozane ewên hozanvan bikardîne peyda dibe.

Vekolerê zimanî yê giringî yê bi peyvên eşkira dike, berê xwe didete peyvan mîna yekên zimanî yên derbirîne ji civaka diken û amaje ji bo xweyetyê û hest û soz û hizreka zindî diken. Ji vêre em dikarin bêjîn hozanvan bi rêya wan peyvan ewên di hozanêda bikar dîne, netinê derbirîne ji hest û wîjdana dil û derûnê xwe yê taybet dike, belkî di heman demda mebesta wî ewe derbirîne ji hest û wîjdana dil û derûnê çenid kesan anku civakan bike.

Herwesan peyv di zimanê asayî da çî bandor û bizaveka bihêz tûneye û mirov hest bi azranidina wê naket. Çunkî bo heman wataya xwe ya ferhengî were bikarînan, û çî ladana zimanî di wataya wê da tûneye, lê heman peyv di hozanêda core jiyân û bizaveka geş ya têda hey, çûnkî hozanvan desitkaryê di dana wê peyvê da dike li gor kawdanê xwe yê helçûnê û merema xwe rêkdêxî û hozana xwe pê divehîne.

BOTANÎ jî mîna her hozanvanekî pir bi şehrezayî û zîrekane ladan û destkarî di yasayên rêkxstin û dirustkirina peyvên hozana xwe da kirine, ji bo dewlemend kirina rûxsarê hozana xwe bi teknîkeka ciwan û serincrakêş, çûnkî peyvan rolekê giring û mezin di avakirina bingehe hozanêda heye.

⁶⁵ Sebirî Botanî, Şîn û Şadî, Sebirî Botanî, Ç:2, Çapxana Elhewads, Bexda, 1984, R.40.

Eve qasek nimûnene ji bo xuya kirna vê rastyê:

Pirsyar ji min kir û got

Boçî herdem dinalî?

Migo dilber tu zanî

Min dest û pê di dava

Tîra kevanê te bu

Berdam çol û beyara⁶⁶

Hozanvanî di van dêranda dû core ladan bikarînane, ladanên fonolojî, ladanên morfolojî, digel pêş û paş êxistinan, ji bo nimûne di dêra dwê da cînavê cuda (tu) bo kesê dwê yê tak ladaye û di dêra sêyê da dengê (n) ji cînavê cuda (min) bo kesê êkê yê tak ladaye dîsan di heman dêrda dengê (t) ji peyva (got) ku morfîma tînsê borye ladaye, dengê (di) peyva (zanî) ladaye, di dêra çarê da cînavê (min) înyê berî her dû peyvên (dest û pê) û dengê (t) ji peyva (pêt) ladaye.

Dîsan di parçeyeka din da dibêje:

Bê hêz û benid û sazî

Rizgar nabîn ji qazî

Dixazim hêsta bêjim

Kela dilî verêjim⁶⁷

Ji vêre hozanvanî hinek ladan ji layê fonolojî û hinek ji layê morfolojî kirine, di heman demda paş û pêş êxistin jî kirine, di dêra dwê da cînavê (em) ladaye, di dêra sêyê da cînavê (ez) ladaye, di dêra çarê da cînavê (ez) paş êxistiye, di heman dêr da dengê (e) ji peyva (bikim) ladaye û di dêra pêncê da cînavê (ez) ladaye.

Dîsa di parçeyeka din da dibêje:

⁶⁶ Sebirî Botanî, Dilstan, R.16.

⁶⁷ Sebirî Botanî, Dilstan, R.28.

Gulê canê te ez birim

Ji dinyayê ez derkim

Dinalim hawar û gazî

Tu nabêjî tu çî dixazî⁶⁸

Di dêra êkê da cînavê cuda (ez) ji bo kesê êkê tak, ku bikere hatye paş êxistin û di navbera berkarî û karî danaye û di dêra sêyê da bikerê (ez) ladaye.

Dîsan dibêje:

Rabû me ve bilez dîsan

Hatim, hatim bizane ku ne bînim ez

Kurê teme, bi te xudan

Viyan û hêz, hizr û jiyar û jînim ez⁶⁹

Hozanvanî di dêra êkê da karê riste (Rabû me ve) pêş êxistiye, di dêrên êkê û sêyê da bikerê (ez) ladaye, di dêrên dwê û çarê da bikerê (ez) paş êxistiye û li dumahyê danaye.

3.2.1.3.Ladanên Sîntaksî

Di vêreda hozanvan desitkaryê di sîstemê rîstada dike û yasayên rêzmanî yên wan têk dide. Anku ev core ji ladana zimanî bi gihorîna bîngê avakirina rîstan û destwajê yên zimanî di nav hozanê radibe. Lê bi çî rengê wataya sereke bernade.

Demê em daxvîn axaftina me ji peyvan pêk dihêt û her peyvek ji wan peyvan watayeka taybet hebit dibêjnê sîntaksî mîna Sadiq Behadîn dibêje “di axaftina xwe da

⁶⁸ Sebirî Botanî, Şîn Ê Şadî, Ç:2, R.106.

⁶⁹ Sebirî Botanî, Şîn Ê Şadî, Ç:2, R.23.

çenid bêjeyan (peyva) bikardînîn û ew bêje yên em bikar dînin ku watyeka dirst bidet û kirin jî têda be dibêjnê hevok-riste”⁷⁰

Xuya dibe ku ziman bi rengekê giştî ji çenid ristan pêk dihêt û her risteyek ji wan ristan ji komeka peyvan pêktêt û ew peyv bi rengekê ciwan û rêk û pêk di rêzkirine û her êk ji wan peyvan wataya xwe ya taybet hene.

Di vêre da em dişêyn bêjîn ku babetê sîntakisî di zimanî da pîte bi yasayên darêtin û rêkxistina peyvan di nav ristanda dide, lê di hozanêda pîte bi şêwazê darêtina têkistê hozanê dide.

Gelek hozana tûşî ladanên zimanê dibin, hozanvan penayê dibete ber vê çenidê daku şêwe û teknîkeka ciwan û hejî ji bo hozanê xwe dabîn bike, lê bê ku wata û mebesta serekî ya têkistê ewa wî divêt bigehîne xwandevanî têkbide. Eve çenid nimûneyekin ji hozanên BOTANÎ ji bo xuya kirina vê çenidê.

Li ber dengê deholâ kurd

Xwe helavêjin pale û cutyar

Nêr û mê bin weku êk bin

*Dem û gavê hemî hişyar*⁷¹

Di vê nimûnê da hozanvanî çenid ladanên zimanî têda kirine, di rista êkê da (pale û cutyar) ji destpêkê ji bo dûmahya ristê hatîne paş êxistin û dengê (di) ji berf karê (helavêjin) ladaye, di dêra sêyê da karê (bin) dû caran hatye, êk ji wan karê rista dumahyêye, di dêra çarê û di heman peyva (hemî) ji destpêka ristê ladaye û dengê (di) ji peyva (hişyar) ladaye. Anku dirstî ya dêra sêyê (nêr û mê weku êk bin) û dêra çarê (hemî dem û gavê di hişyarin). Dîsan dibêje:

Kuştim sihra pîr hevuka

*Pilpilok û nivştoka*⁷²

⁷⁰ Mihemed Elî El Hisnî, Lixe El Şî'R We `Ilim Eswat Ellxewî, Micelle Seqafe, El Ededan: 8+9, Dar Elhurye Litiba`E, Bexdad, 1990, S34.

⁷¹ Sebirî Botanî, Şîn Ê Şadî, Ç:2, R.23.

⁷² Sebirî Botanî, Pahîz, R43.

Di vê nimûnê da karê (kuştîm) îneye destpêka ristê û wata pêşxistin u paş
êxistin di sîntaksê da kirîn, çunkî bikerê ristê (ez) ladaye di ristêda. Di parçeka din da
dibêje:

Ez her evim ez her evim

Bawer bike ez her evim

Ger ku ji bona dilberê

Canê şîrin bêtin dere⁷³

Eger em vê parça hozanê bimeyzînîn dê bînîn ji bilî ladana sîntakisî ladana
fonolojî têda hafîne kirin, çunkî dengê (e) ji peyvên (evim) ladaye û heman deng cihê
navê cuda (m) ji bo kesê yê êkê tak ladaye û tîpa (e) ji peyva (ger) ladaye û ladan
sîntakisî jî bikerê ristê (canê şîrin) paş êxistiye û li berî karê danaye û dengê (h) ji
peyva (bên) ladaye.

Hozanvan dibêje:

Jarê azê dil bi xemê

Ser te çi hat serê meme

Were lawo tu serwerî

Evîna te ser vî serî⁷⁴

Di vêreda hozanvanî ladana fonolojî û sîntakisî kirine, ji layê fonolojîve dengê
(ê) ji peyva (ser) ladaye û (serte) pêş êxistiye û ji destpêka ristê danaye û karê (hate) ji
berî (serte) ladaye. Dîsan dibêje:

Rehmê bike poşmanim ez

Gêjim, çi dikim nizanim

Jibîr nakim

⁷³ Sebirî Botanî, Şîn Û Şadî, Ç:2, R.32.

⁷⁴ Sebirî Botanî, Şîn Û Şadî, Ç:2, R.63.

*Axaftinên te ji bîr nakim*⁷⁵

Di vê parçe hozanê da eşkiraye ladanên zimanî têda hatîne kirin, li rêza êkê bikerê (ez) paş êxistiye û ji dumahî ya ristê danaye, karê ristê (poşmanim) li berî bikerê (ez) danaye û karê dwê yê ristê (rehmê bike) ji destpêkê danaye, li rêza dwê bikerê (ez) li berî karê (gêjim) ladaye û bikerê (ez) pêş êxistiye, ji pişt karê (nizanim) û (çi dikem) pêş êxistiye berî (nizanim ez) û dengê (e) ji hemî peyvên (kim) ladaye di rêza sêyê da bikerê ez û berkarî (tu) hatîne ladan û di rêza çarê bikerê ez ladaye.

3.2.1.4.Ladanên Sîmantîkî

Peyv di zimanîda cudaye ji peyva di hozanê da, çunkî erk û karê peyvê mîna tak ji erk û karê peyvê mîna kom ji hev cudahya wan tûneye, ev erk û kare gehandineke were kirin û bi rêya dangan dihên û girîman diken, lê erk û karê peyvê di hozanê da pêktêt ji helkolana gencîneya fikrî ya mirovî. Eger ji bo demekî şewazên zanayên sîmantîk bixwazin di wî demîda peyv di zimanî da (wata) û (veguhastin)e.⁷⁶ Lewma ladana sîmantîkî bûye alaveka karîger ji bo şirovekirin û vedîtina wataya veşartî ya têkistê, çunkî wataya deqî di rûyê serveyê wê da bi eşkirayî xuya nabin. Lewma em (*dikarin bi rêya zanstê watayê mîna rêyeke rexneyî, bingehên deqî bixwînin û layenên hunerî yên wê eşkera bikin*)⁷⁷ Di vêreda xuya dibe ku peywendîyeka mikum di navbera peyv û watayê da heye û watayê bandoreka pir mezin li ser peyvê heye, çunkî wataya bihêz û ji encamê pêkhatina rêk û ciwan ji bo peyvên rêkxistî dihête dirustkirin.

Hozanvan ladanên sîmantîkî di nav hozana xwe da bikardîne daku pitir bandorê ji xwendevanî biket û nerîna wî ji bo wê wata û mebesta di derûnê wî da û ya veşartye ji pişt wan peyv û riste û destewajên rêkxistî di nav hozanê da hene bikêşe. Ji bo şirovekirina vê core ladana zimanî dinav hozanên BOTANI da, dê çenid parçeyên hozanê mîna nimûne wergirîn. Hozanvan dibêje.

Dil bi kul û janîm

Bê nav û nîşanim

⁷⁵ Sebirî Botanî, Pahîz, R8.

⁷⁶ Tizfitayn Tuduruf, Neqîd El Neqîd -Rwaye Te'elûm-, T: Dr. Samî Sudan, Mirace'e Lîlyan Suydan, T:2, Dar El Şûn Seqafye Elamme, Afaq Erebye, Bexdad, 1987, S34:

⁷⁷ Dr. Wehab Elî El'îdwanî, Elzerure Al Ş'Rye, Cami`E Elmusil, Metbe`E Te`Lîm Alî, 1990, S117.

Tiştêkê ji xwe nizanîm

Şikestî me

Mişextîme

Sitembarîm

Gunehkarîm

Fihêtkarîm

Ji welat jî

Şermezarîm

Bê pênasîm

Xwe nenasîm

Çax û demîm

Ne jî ademîm⁷⁸

Ladana sîmantîkî di vê hozanêda li ser hemî dêrên parçeyên hozanê hatye belavkirin, di vêre da hozanvan xwe bi kesekê neyê dyar û bê nav û nîşan dînîte ziman ku çî tiştî ji xwe nizane. Jiber hindê demê hozanvan xwe pênasê dike, xwe bi mirov nadete naskirin, anku jî dîndeha ademî nizane.

Dîsan dibêje:

Roja rohin li min şeve

Jîn û mirna min wek heve

Wesa jî soza min eve

Ku te nedim bi berdêlî⁷⁹

⁷⁸ Sebirî Botanî, Şîn û Şadî, Ç:2, R.64.

⁷⁹ Dîwanên Serbirî Botanî (Şîn û Şadî, Dilstan, Bilura Çîyan) R.212.

Lada sîmantîkî (Roja rohin li min şeve) çunkî ew gelek rojên nexweş di nav dîwarên zindanê borandine, em dizanin jurên wê di tarîne û çî ronahî jî nagehîte dinav da. Lewma ew kesê di nav da dîjî hest bi borîna demî nake û nizanît ka kengî roje û kengî şeve, belkî ji dev wî hergav şeve û çî caran roj nahêt, her jiber vê çenidêye ew çî hest bi xweşî yê jyanê naket û li dev wî eger bi vî rengî be çî cudahî dinavbera jyan û mirna wî da tûneye, û digel wê çendê jî sozê dide ku welatê xwe bi çî cihan naghore.

3.3. PEYV Ê ZARAVÊN GELÊRÎ DÎ HOZANA SEBRÎ BOTANÎ DA

Hozana nû bi renekê giştî pêkul kirye bi her renekê hebe xwe ji zimanê hozana kevin rizgar bike, çunkî hozanvanên kevin peyv û zaravên biyanî di nav hozanên biyanî di nav hozanên xwe da bikarînan.

Zêdebarî wê çendê wan şarezayyeka baş di zimanê biyanî da hebû, ji ber hindê hozana nû mîna şorişekê bû dijî zimanê hozana kevin, hozanvanên nû bi hemî şyanên xwe li pey peyv û zaravên kurdî yê petî û gelêrî gerhan û di nav hozanên xwe ra bikarînan da hemî texên civakê wan têbgehin û xwandevanên hemî astên xwandinê jî bikarbin bixwînin.

BOTANÎ jî mîna êk ji hozanvanên hozana nû hozanên xwe bi çendîn peyvên kurdî yê petî û gelêrî yê ciwan vehandiye, çunkî eve dibe êk ji taybetmendiyên hozana nû ya kurdî, ji bo xwya kirina evê rastyê dê çenid nimûneyekên hozanê ji hozana BOTANÎ wergirîn:

Cengxwaz û gunehkarin

Rêgir û sitemkarin

Çenid xapînok û dizin

Xwe froş û xinzin

Kurdên me⁸⁰

Nerîna xwandevanî di vêreda bo peyva (xinzin) dihête rakêşana, wataya wê jî (xayn) anku bo mirovên xayn û bê bawer û bê wefa were bikarînan.

⁸⁰ Sebirî Botanî, Şîn Ê Şadî, Ç:2, R.17.

Dîsan dibêje:

Şebînim li sor gulê şêla

*Dest û hinav ketin pêla*⁸¹

Di vê nimûnê da peyva (Şebînim) ya serincrakêşe, ev peyve bi wataya (xumav) were bikarînan. Di parçeka din ya hozanê da dibêje:

Bi xûna xwe te dixwazin

Kêşa jar û hejarnî

Bejin û bala te alose

*Dîla hovên bêwjdani*⁸²

Di vê parçe hozanê da sernca mirovî ji bo peyva (alose) dihête rakêşana, bi wataya (rind û ciwan) dihêt, anku demê saloxdana bejin û bala kesekê were kirin.

Hozanvan dibêje:

Tu avisî

*Daku bizê*⁸³

Di vêre her dû peyvên (avis) û (bizê) serincrakêşn wataya peyva (avis) anku (pîtandin) bi wataya (cûtbûn) dihêt. Peyva din jî (bizê) peyveka sadeye ev peyve ji bo jinê û gyandaran bi wata zêde bûnê were bikarînan.

Dîsan dibêje:

Xwpanê gundê, dêranê xanî

*Li min maye xir û xalî*⁸⁴

⁸¹ Sebirî Botanî, Şîn Û Şadî, Ç:2, R.18.

⁸² Sebirî Botanî, Şîn Û Şadî, Ç:2, R.34.

⁸³ Sebirî Botanî, Dilstan, R.15.

⁸⁴ Sebirî Botanî, Pahîz, R48.

Di van herdû dêranda (dêranê) û (xir û xalî) dû peyvên kurdî yê petîne, çunkî peyva (dêranê) peyveka kevinare û ji bo cihên kevin ku maweyek bi serve çûye were bikarînan, peyva (xir û xalî) jî peyveka lêkdaye û bi wataya (vale) dihêt anku cihekê valaye û çû tişit têda nîne.



3.4. WÊNÊ HOZANÊ

Êk ji regez û binemayên giring û sereke di avakirina hozanêda wênê hozanêye, çunkî wêne rolekê pir bandor di binyatê hozanê da nîşan dide û bi rêya bêje û peyv û destewaje yên zimanê hozanê dihên berceste kirin.

Wêne di hozanêda mîna zincîreke xudîkane yên di nav goşeyên cuda were danan, bi rengkî rengvedana babetî bike û di rûyên cuda da perve pêşve diçe, lê ev wêne sihrîne û ne tinê rengvedana babetî diket, belkî rûyê jyanê jî jê ra dide, çunkî dikare canê jyanê û rûyê wê bêxe berçav.⁸⁵ Xuya dibe wênê hozanê pira peywendyêye dinavbera rûxsarê û naveroka hozanêda, dişê bi rêya wê ji layê rûxsarê ji bo naverokê derbaz dibe.

Herwesan wênê hozanê alaveke ji alavên zimanê hozanên ku hozanvan ji bo xwya kirina ezmûna xwe ya hozanê xwe bikar dîne.

3.4.1. Giringî ya Wênê Hozanê

Wênê hozanê cihekê taybet di nav hozanêda bixweve dîtye, çunkî êke ji stûnên ragirtina layê hunerî yê hozanê, herwesa regezeke girnge di pêkhatina hozanê da. Ta radeyekê dikarî bêtî wênê hozanê regezeke hunerî yê hevpişke di navbera rûxsarê û naveroka hozanê; çunkî bi rêya wênê hozanê û zimanê wê mirov dikare bigehîte ew tiştên dinav derûnê hozanvanî da hey.

Hinek ji rexnegirên turey dibêjin (*Hozan wêne kêşana tabloyekê hunerî ya şêwekarye bê reng û hêle kêşan were encamdan, ew tabloye jî dibêjnê Hozan, wêne kêşana wê jî ji cihê rengan û hêlan û qelemî peyvên pir ji siruştê xweş û nazik were encamdan, anku hozanvan behremendtrîn kese dikare tabloyeka hozanê ya xwe bi peyvyan bikêşe û lawtirîn hozanvan jî ewe yê ku baştirîn teknîk û guncawtirîn peyv di ciwantirîn wêne da ji bo hozana xwe bikardîne*)⁸⁶ kewate hêz û ciwanî ya wênê hozanê pişt bestinê li ser rada şyanên hozanvanî ji bo hilibijartina bêjer û peyv û destewaje û ristên guncay digel wî helwêstî ewê derbirîn jê tê kirin dike.

⁸⁵ Ebidul Selam Necmedîn`Ebidulla, Şikirdneweî Dqî Ş`Rî Le Rwî Zimanewanyewe, Nama Masterê, Zankoya Selahedîn, Kolîja Ziman, Hewlêr, 2007, R.51+52.

⁸⁶ Dr. Wehab Elî El`îdwanî, Elzerure Al Ş`Rye, Cami`E Elmusil, Metbe`E Te`Lîm Alî, 1990, S117.

Hozanvan ne tinê wênê tiştên dikevîne pêş çavên mirovî yan ber destê mirovî dikêşe, belkî di heman demda wênê tiştên zeynî jî dikêşe û wataya wan di eqil û hizra mirovî da berceste dike.

Wênê poyetîkayê di avakirina hozanê da kerestekê serekîye û regezê girnge ku pişikdaryê di êkgirtina hozanê ya orgaîzmî da dike, hozanvan di vê çendê ra hestdaran dilivlivîne û mifayê ji aşupê û sozê werdigre ji bo çekirina wêney, hozan di guherê xwe da prosêseka efrandinêye dinavbera hozanvanî da û can û wîjdana wî da.⁸⁷

Li gor vê çendê wênê hozanê dibe êk ji wan regezan yên ku digel regezên din yên têkistê hozanê (Ziman, Şêwazê Hozanê) êkgirtineka organîzmî dirst dike, hosan wênê hozanê rolê ciwankaryê û rohinkirinê di binyatê hozanê da digêre, çunkî wênê hozanê mîna xudyekêye naveroka hozanê derdixe.⁸⁸ Wênê hozanê alaveke xwandevan dikare bi rêya wê bigehe kûratyê ya têkistê hozanê û vekolînê têda bike, çunkî wênê hozanê rengvedana babetê hozanêye.

Herwesan wênê poyetîkayê dibe guherê dahênanê û bi çû renekê nabe kûratya dîtnê ji dev hozanvanî an bercestekirina wêney were kirin, bê ku şyanên dahênanê di wênegirtina hunerî da nebin, ev nerîne berev kûratyê diçe bi rêya wan wêneyan ewên axaftina wî hozanvanî ji ya êkê din cuda dike.⁸⁹ Anku wênegirtina hunerî bi giringtirîn regez û binemayên her têkisteka edebî were danan.

3.4.2. Têgeh û Pênase yên Wênê Hozanê

Mîna me berî niho jî amaje pê kirî ku wênê hozanê derazînkeke ji bo xwandevanî bi rêya wê dikare ji layê hunerî yê têkistê hozanê biçe dinav naveroka babetê deqî da û bi wê çendê xwandevanî ji hizr û boçûnên hozanvanî li hember helwîstekê destnîşankirî di jyanê da ku hozanvan têda jyaye û pê agehdar dibe, çunkî wênê hozanê rengvedana wî helwîstye.

Bi renekêê giştî têgehê wênê hozanê amajê ji bo wê wênê (Image) ya zimanê Îngilîzî dike û yê hevpişke digel rengê aşupê (Imagination) peywendîyeka mukim

⁸⁷ Dr.Şukirî Mihemed `Eyad, Ellxe Wel Eybda`, Înter Naşyonal, Libinan, 1988, S79.

⁸⁸ Mihemed Elî El Hisnî, Lixe El Şi`R We `İlim Eswat Ellxewî, Micelle Seqafe, El Ededan: 8+9, Dar Elhurye Litîba`E, Bexdad, 1990, S34.

⁸⁹ Newzad Ehmed Eswed, Bîrî Rexney Hawçerx, B.C, B.M, R2016.

dinavbera wanda heye, çunkî aşup wêney di hozanêda xuya dike. Herwesa di warê zanînê da di hevpişkin.⁹⁰

Herçende (Bîtis) ji wê çendê zêdetir diçe ku wênê hozanê hunertirîn pişke di avahyê hozanê da û dibêje (*Min ziman tûneye û hemî tiştên min heyn ji komeka wêne û lêkçûn û çevengan derbaz nabin*)⁹¹. Lê ya dirst nîne wênê hozanê hemî regezên din yên hozanê piştguh dêxît, belkî hemî regez pêkve binyatê hozanê pêk dîne, hozanvan bi rêya hozanê nerîn û soza derûnê xwe digehîne xwandevanî, çunkî (*Wêne di hozanêda ew şeweye ewê soza hozanvanî têda dibure û nerînên wî jî xuya dibe, wî tiştî destnîşan dike ewê wî divêt bigehîne, ew jî ew derbirînin ewa hest û soz û nerînên hozanvanî vediguhêze*)⁹². Li gor wê çendê wêne dinav ezmûna hozanê da dibe endamekê zindî di binyatê huneryê hozanêda û eve jî dibêjnê (*Organîzmî ya hozanê*)⁹³

Hozanvan wêneyên xwe ji jîngeh û dormandorên xwe werdigire û paşî wan wêneyan digel hest û soz û aşupên xwe têkel dike û mîna wêneyeke pêkhatî ji aşup û dûrhêlî di nav deqê hozanêda berçav dike.

Derbarê pênasekirina wênê hozanê (bilinîskî) dibêje (*Çû byavekê dahênanê tûneye ku mîna hozanê giringiyê bide wêney, hozan komeka wêne û peyvane bi renekê taybet xuya dike û hozan jî hizr kirine bi rêya wêneyan*)⁹⁴ çunkî wênê hozanê bi alîkariya wan deng û peyv û destewaje û ristên rêkxistî ji layê hozanvanîve dinav mejiyê me da çêdibe, çunkî hozanvan bi hemî hêz û şyanên xwe yên hunerîve ji bo efrandina wêney û veguhastina wî ji bo me bizavê dike, lê bi mercekî ku pêdivye ew wêne yê guncayî be digel dûrhêlê ezmûna kesayetya hozanvanî û bi vê çenidê wênê hozanê yê cudaye ji wêneyên din yên hunerî.

⁹⁰ Norman Firîdman, Elxeyal Elislub El Hedase, S207.

⁹¹ Sadiq Elbehadîn Amêdî, Rêzmana Kurdî, Ç:1, Çap û Weşanên Dar Elseqafe `Amme, Bexd, 1987, S.445.

⁹² Mihemed Elî El Hisnî, Lixe El Şî`R We `İlim Eswat Ellxewî, Micelle Seqafe, El Ededan: 8+9, Dar Elhurye Litiba`E, Bexdad, 1990, S46.

⁹³ `Ebidul Selam Necmedîn`Ebidulla, Şikirdneweî Dqî Ş`Rî Le Rwî Zimanewanyewe, Nama Masterê, Zankoya Selahedîn, Kolîja Ziman, Hewlêr, 2007, R.51+52.

⁹⁴ Hemdye Hesên Mihemed, Layê Hunerî û Naveroka Hozana (Sebrî Botanî), Nameya Masterê, Zanîngeha Dihokê, 2009, R.73.

Her bi heman şêwaz jî (Kolîrêdc- Colerdig) dibêje (*hozan core wêne kêşaneke bi rêya peyv û ristan dihête encamdan, bi mercekê ew wêne yê ji hest û sozên hozanvanî tijîbe*)⁹⁵

(Buşra Yusif Salih) derbarê wênê hozanê dibêje (*ew xudîke ewa ne tinê rengvedana saxlet û rûyê dahênana hozanvanî dike, belkî rengvedana taybetmendiyan wê qonaxa hozanê ewa hozanvan têda bi pişkek ji wê qonaxê were hejmartin dike*)⁹⁶. Xwya dibe kesayetya hozanvanî û ew dûrhêl û serdemê têda dijî, rolê xwe yê xudan bandor di efrandina wênê hozanêda yê hey, çunkî wênê hozanê rengvedana hizr û nerîn û hest û sozên derûnê hozanvanî li hember wî serdemî û dûrhêlê serederî yê digel da dike.

3.4.3. Wêne Di Hozanên Kevin û Nû Da

Rexnegirên kevin û nû pir giringiyê bi wênê hozanê da, ji dev wan wênê hozanê êk ji şengistên here giringe di avahiyê hozanêda, çunkî wan berê xwe dida wêney mîna regezê girêdanê dinavbera rûxsarê û naveroka hozanê da.

Bo nimûne ji rexnegirên kevin ku giringiyê bi wêney daye, eve jî (Cahize) ji sala (55 b.m.) mirîye. Wesa fikir dika ku wênegirtin taybetyeka giringe ji taybetmendiyan avakirina hozanê, çunkî wêne ji cem wî (*Pêkhatineka bihêze û bi şarezayî ya xwe pişikdaryê di poyetîkaya hozanvanî ra dike, zêdebarî regezên din yê avakirina hozanê mîna muzîka hozanê û şêwazê hozanê û darêtina bêjeya pir ciwan*)⁹⁷

(Ebidulqehar Curcanî) û xudanên felsefeka ciwankaryê eger, bihêlîn ji bo rêbazên din yê klaîkî ewên gelek giringiyê didene wêneya rûxsarî, çunkî ew pir giringiyê didene darêtinê û timambûnê di pêkhatê da. Lê romansî ji vê çendê rizgar bibûn, çunkî ew watayê bi ser bêjey û madê bi ser wêney pêş dêxît, dibe ew danpêdanê bi hebûna wêneyekê dyarkirî ji bo derbirîna turey nakin. Anku her destewajeyek ya başe ji bo vê derbirînê eger bi dirstî were bikarînan.⁹⁸ Xuya debe

⁹⁵ Hemdye Hesên Mihemed, Layê Hunerî û Naveroka Hozana (Sebrî Botanî), Nameya Masterê, Zanîngeha Dihokê, 2009, R.74.

⁹⁶ Hemdye Hesên Mihemed, Layê Hunerî û Naveroka Hozana (Sebrî Botanî), Nameya Masterê, Zanîngeha Dihokê, 2009, R.76.

⁹⁷ Hemdye Hesên Mihemed, Layê Hunerî û Naveroka Hozana (Sebrî Botanî), Nameya Masterê, Zanîngeha Dihokê, 2009, R.79.

kilasîkî pîte didene rûxsarê deqê hozanê, lê romansî pîte didene naveroka deqê hozanê.

Hinek rexnegir gelek dûrtir ji vê çendê diçûn û ji bo şirovekirina wêneyên dúbarejirî bi hejmartina wêney mîna nîşanekê li ser armanic û hêvî yên nivêskarî û bêzarî û dalxedana wî bizavê diken. Zêdebarî hest û sozên evînê û kerib û kînê ewên veşartî di nav derûnê hozanvanî da. Ne eşkiraye têgehê şirovekirina ronî alikariya berbelav bûnê evê arasteyê dike dinav vekolînên turey da, ji alyekê din ve ew gengeşa nivêskar (Karolîn Sibircin)ê ji wêneya şikspîrî peyda kirî ewê sîberê gumanê havêtne sere wan derencama ewên vekoleran ji wêneyên hozanê derêxistin.

Hijmareka nvêskaran palpiştuya evê gumanê diken, bi taybetî ewên ezmûnên wan palderên wan bûn. Pîte pêdana wan ya dilgîr bûn û nexweşiya wan çû kartêkirnê li ser xwastin û lêkçwandinên wan nake.⁹⁹

Zêdebarî wan arasteyên berbelav ji dev rexnegirên hev çerix ji ereb û rojava û rojhelatnasan ji bo vekolîna wênê huneryê her karekê turey bizavê dike, lê rastya wêney berdewam vemaye cihê jêk cuda bûnê ji dev wan rexinegiran di byavên destnîşankirnê da û bi wê çendê berev rêbazên nêzikî alozyê û mijdaryê behra pitir ji yên eşkira kirnê diçûn.¹⁰⁰

Hosan wênê hozanê di vekolînên rexina rojavayê da ciheka taybet di avakirina hozanê bixweve digre.¹⁰¹ Anku wêne guher û xizmetkarê hozanêye û wê êkgirtina hozanê ya aloz eşkera dike¹⁰², wênê hozanê zêdebarî rolê wê yê giring û bihêz di avakirina binyatê hozanê da gelek ji tiştên veşartî û tarî di hozanê da ron û eşkera dike. Hozanvan bi rêya aşupa xwe ya berfreh û deng û deng û peyv û destewajên rêk û pêk û ciwan, ciwantirîn wêne yên siruştî ji jyana civakî ya rojane ya xelkê asayî berceste dike.

Anku hozanvan bi hêza aşupê bihayê hozana wî ji layê wênegirtinê ve dihête hilsengandin, ev aşupa berfireh an jî ya dirustkirî hinek corên din ji aşupa kertî di nav

⁹⁹ Hemdye Hesên Mihemed, Layê Hunerî û Naveroka Hozana (Sebrî Botanî), Nameya Masterê, Zanîngeha Dihokê, 2009, R.78.

¹⁰⁰ Ehmed Mihemed, Sinaîye El-Şî'r We El-Nesir Fî El-Fikir El-Neqidî, S34. Mifahîm El-Şî'r, Hesên Nazîm, S36.

¹⁰¹ Desteka Nivêseran, Xeberekê Nexweş, Rojname Botan, J 5, Çirya Duwê 1991'de, R23.

¹⁰² Ehmed Mihemed, Sinaîye El-Şî'r We El-Nesir Fî El-Fikir El-Neqidî, S34. Mifahîm El-Şî'r, Hesên Nazîm, S38.

ziman û destewajên turey da were dîtin, çunkî ziman û destewajên wî hozanvanî di aşupê wêney dane, can û helametên bê sinûr ji xwaze û lêkçwandinê û xwastinê têda dijîn, çunkî turevan bi heman dîtina me tiştan nabîne, belkî canê wan tišta dibîne.

Anku aşupê ew hêz û zalbûna di destê hozanvanî daye û ji wê aşupê wêneyên xwe yên hozanê pêkdîne, çunkî aşup guherê dahênana karê tureyye û pêtîvye hozanvan xudan aşupeka afrênerbe, daku bikare dahênanê di dirustkirina wêneyên xwe yên di hozanêda bike.

Di vêreda xuya dibe wênê hozanêne tişteke nûye, çunkî her ji destpêka peydabûna hozanê û heta evroke hozan li ser binemaye wêney dihête vehandin, wêney cihekê giring û karîger di avakirina binyatê hozanê bixwe ve girtye, lewma am dibînin bikarînanana wênê hozanê ji dev hozanvanekê ji bo hozanvanekê din jêk cudaye, her ev çendeye dibe agerê cudabûna wêney di hozana kevin da ji wêney di hozanan nû da ji alyê bikarînanêve.

3.4.4. Corên Wênê Hozanê

Hozanvan ji bo xemilandina hozana xwe çendîn corên cora û cor ji wêneyan dinav hozanêda bikardîne, lewma ya fere av core wêne bihêne destnîşankirin. Ji bo vê çendê rexinegiran wênê hozanê li ser çenid coran dabeş kirine, mîna her regezêkê din yê alyê hunerî yê hozanê. (Dr. Mihemed Bekir) wênê hozanê li ser dû binemayan dabeş dike:

A- Binyatê Sîmantîkî: ev binyate sîstemê gihorînê ye ji nîşankarê êkê ji bo yê dwê û sêyê.

B- Binyatê Hunerî: bi regekê giştî ev binyate regezê lêkçûnêye dinavbera nîşankarî da û nîşankarên din da.¹⁰³ Herwesa (Neuzad Ebdulla Hesên) wênê hozanî li ser van coran dabeş kiriye:

1- Dabeş bûna wêney ji alyê avahiyêve.

2- Dabeş bûna wêney ji alyê bizavêve.

3- Dabeş bûna wêney ji alyê rewanbêjyêve.

¹⁰³ Tizfîtayn Tuduruf, Neqid El Neqid -Rwaye Te'elûm-, T: Dr. Samî Sudan, Mirace'e Lîlyan Suydan, T:2, Dar El Şûn Seqafye Elamme, Afaq Erebye, Bexdad, 1987, S45.

Dabeş Bûna Wêney Ji Alyê Avahiyêve

Wêne ji layê avahiyêve li ser sê coran dihête dabeşkirin:

- 1- Wênê Sade (Tak).
- 2- Wênê Lêkday (Aloz)
- 3- Wênê Bi Hevrayî.

3.4.4.1.1. Wênê Sade (Tak)

Ev core bi sadetirîn wênê hozanêve ji alyê avahiyê hozanêve, çunkî ji peyveka sade an lêkday an jî ji peywendiyeka sade dinavbera nîşankiryan da û rista sade dirust dibe, vêca ev wêneye çî peyveka serbest be an wênê peyva ristê be.¹⁰⁴ Anku ev wêneye pêkhatineka sadeye, çunkî peyveka sade an lêkday pişikdaryê di pêkînana wê da dike, ev core wêne di hozanên BOTANÎ da, hatîne bikarînan. Ji bo nimûne:

Welatê me tev xwîn û cenge

Ev çî jîne ey hewar¹⁰⁵

Ji vêre hozanvanî wêneyekê sade bikarînaye ji bo derbirînê ji kawdanekê yê nexweş û ne aram bi rêya bikarînana peyvên (xwîn, ceng), ev herdû peyve di sade û serbixwene, peyva (xwîn) êkser rengê sorê xwînê ji ber çavên me dirustdike, bi heman şêwe jî peyva (ceng) jî dîmenê şerî û top û balefiran were pêş çavên me. Dîsan dibêje:

Her bijî bijî bijî

Milleto bijî bijî

Pilinge rabo serpê

Kurmanc û lek û lûrî¹⁰⁶

¹⁰⁴ Sebirî Botanî, Dilstan, R.121.

¹⁰⁵ sebirî botanî, şîn û şadî, Ç:2, r.26.

¹⁰⁶ sebirî botanî, şîn û şadî, Ç:2, r.35.

Di vê parçe hozanêda peyva (piling) wênekê sade û serbixweye, demê em dibêjîn (piling) dê êkser wênê pilingekê dinav mejiyê me da dirustdike, ku mebest jê bihêzî û zîrekîye li meydana şerî.

Hozanvan dibêje:

Ronak dibit jîna tar

Pêş deçin xebatkar¹⁰⁷

Li vêre eşkiraye dû wêneyên sade hefîne, mîna (ronak, tarî), her êk ji wan wênê peyveka sade û serbixweye, peyva (ronak) êkser dîmenekê ron û geş dihête pêş çavê mirovî û berovajî vî dîmenî peyva (tarî) dîmenekê tarî dihête ber çavê mirovî, anku wêneyekê hevdije, lê mebesta hozanvanî ne ev çendeye, belkî mebesta wî ewe ku piştî tarî û derdeseryê û nexweşyê dê ron û geş be.

Dîsan hozanvan dibêje:

Ew çiruska azadyê

Ji nişkanve vemrandin

Doz û daxwaz û vîna me¹⁰⁸

Li vêre hozanvan wêneyekê sade bikarînaye bi rêya peyva (çirusk) ev peyve sade û serbixweye êkser dîmenê çirusk vedanê li cihekî an jî tiştan di nav mejiyê me da dirustdike. Ku mebest ji hîvî û nerîneka geşe ji bo dahatî:

3.4.4.1.2. Wênê Lêkday (Aloz)

Ev core wêneye birîtye ji têkel kirina dû wêneyên sade yan sade an pitir ji dû wêneyan ji bo derbirîna helwîstê hizrekê an sozekê, demê ev helwîste û hizre nikarin bi rêya wênê sade bihête bicih înan. Anku (*ew wêneye ji komeka wêneyên sade (tak) pêktêt, lê bi mercekî di şyan û rêxistinê da be, wêneyên tak bibine êk ji bo*

¹⁰⁷ sebirî botanî, dilstan, r.56.

¹⁰⁸ sebirî botanî, dilstan, r.72.

pêşkêşkirina sozekê an hizrekê an helwîstê hizreka kûrtir û aloztir)¹⁰⁹ di hozanên BOTANÎ da ev core wêneye hatye xuya kirin, ku dibêje:

Karwanê şehîda çû

Nîvî pitir zarok bûn

Gelek heval û hogir

*Li ber çavê min hinda bûn*¹¹⁰

Wêneyê (karwanê şehîda) di vê parçe hozanê da wênê sereke û lêkdaye, wêneyên din jî mîna (zarok, heval, hogir, hinda) tev ketîne di xizmeta wêne û wataya serekya di vê parçe hozanêda, eve hemî jî wêneyên sade û berhestin, çunkî demê mirov dibêje zarok êkser wêneyê zarokêkê dihête pêş çavên me an jî bêjîn (heval û hogir) an jî herkesêkê din êkser wênê wan dihête ber çavên me, di vêreda hozanvanî derbirîn ji dîmenê şehîd bûnê kirye û xuya dike gelek ji kesûkar û hevalan, tev ji demekê canê xwe ji destdan û kelexên wan di tev cihan belav bûn û mîna xewnekê hemî ji pêş çav çûn û winda bûn heta hetayê.

Hozanvan dibêje:

Top û moşek bê jimar

Wek baranê dihatin xwar

Li ser welatê nazdar

*Çiya û deşt, dol û zinar*¹¹¹

Di van dêrên hozanê da çenid wêneyên sade hafîne bikarînan ji bo pêkînana wêneyekê lêkday mîna wênê (li ser welatê nazdar) eveye wênê sereke di van dêranda û dibîte senter ji bo wan hemî wêneyên din di xizmeta wê da mîna (top û moşek, bê jimar, wek baranê dihatin xwar, çiya û deşt, dol û zinar) bi rêya wan wêneyan dîmenên şerî û hêrşkirinê xuya dike. Biraştî hozanvanî bi rengekê gelek ciwan û

¹⁰⁹ newzad ehmed eswed, bîrî rexney hawçerx, b.c, b.m, r2016.

¹¹⁰ sebirî botanî, pahîz, r45.

¹¹¹ sebirî botanî, pahîz, r47.

serkeftî ev wêneye di nav dêranda xuya kirye, çunkî ewî ev dîmene bi çavên xwe yê dîtye.

3.4.4.1.3. Wênê Bi Hevrayî

Ev core wêneye çenid wêneyên sade û lêkday ku bi rengekê rêk û pêk hatîne danan, lewma ev wêneye birîtye ji (*komeka wêneyên sade û lêkday pêk dihêt û wan wêneyan çû peywendî bi hevdûve tûneye û dibê senterin, lê tev bi hevrayî xwe dene hev û wêneyekê bi hevrayî dirustdiken*)¹¹² ji bo dyarkirina vê çendê dinav hozanên BOTANÎ da, dê çenid nimûneyekên hozanî ji hozanên wî wergirîn, ku dibêje:

Wek hevalan ciwanê kurd

Tu jî rabe bi deng

Zenid û bendan tu rapêçe

Dest bavê darê tivenig

Jîr û çalak xwe bavêje

Bi mêranî tu bistîne

Vê welatê şox û şenig

Hilû bira rabe ji xew

Li me kurdan bû direnig

Baş bizane tu bê mafî

*Ger nestînî tu bi ceng*¹¹³

Di vêreda hozanvan di parça êkê da çenid wêneyên mîna (heval, kurd, deng, zenid, benid, dest, dar tivenig) bikarînayne, her êk ji wan sade û serbixwene û çû peywendî bi yên dive nîne, lê van wêneyan hemî xwe dayne êk û kombûyne ji bo dirustkirina wêneyekê bi hevrayî digel wêneyên din yên sade ewên di parça dwê vê

¹¹² `ebidul selam necmedîn `ebidulla, şîkirdneweî dqî ş`rî le rwî zimanewanyewe, nama masterê, zankoya selahedîn, kolîja ziman, hewlêr, 2007, r.103.

¹¹³ sebirî botanî, şîn û şadî, Ç:2, r.116.

hozanê da hatîne bikarînan, mîna (jîr, çalak, law, çak, çelenig. welat, şox û şenig) van wêneyan jî digel wêneyên parça sêyê ji hozanê mîna (bira, xew, direnig, maf, ceng) wêneyekê bi hevrayî drustkirye.

Di heman demda wêneyên parça sêyê kombûyne û digel wêneyên parça êkê û dwê da di encamda wêneyekê bi hevrayî li sertaserî hozanê drustkirye, mebesta hozanvanî jî ji kêşana wêneyekê bi hevrayî di hozanê da.

Bê sinûr û bê alim

Bê kes û bê hevalim

Hawar wêran malim

Digirîm û dinalim

Maf wînda me lê digirim

Jan gehaye cegerim

Hawar ev çi jîne

Wekhevî her nîne

Mirovekê kevnarim

Xwedanê şûn û warim

Hawar sitembarim

*Lewre peyt û harim*¹¹⁴

Di vê nimûnê da hozanvan çendîn wêneyên sade û serbixwe têda bikaranîye, di parça êkê da wêneyên mîna (sinûr, al, kes, heval, mal) hatîne, di parça dwê da wêneyên mîna (man, jan, jîn, cerig, wekhev) hatîne, di parça sêyê da wêneyên mîna (mirov, kevin, xwedan, war, sitem, peyt, har) têda hatîne bikarînan. Weke eşkira di van her sê parçeyên vê hozanêda ew wêneyên hatîne bikarînan, her êk ji wan yê sade

¹¹⁴ Sebirî botanî, Dengê metîn û cudî, R26.

û serbixweye û çû peywendî bi yê din ve tûneye. Lê van hemî wêneyan xwe dayne êk û kombûyne ji bo pêkînanana wêneyekê bi hevrayî li ser tev dêrên hozanê.

3.4.4.1. Dabeş Bûna Wêney Ji Alyê Bizavêve

Wêne ji layê bizavêve tinê hozanvan dikare bikarbîne, çûnkî peyv keresta wê ya serekîye ji bo wênekêşanê û derbirînê. Wêne ji layê bizavêve liser dû coran were dabeşkirin:

3.4.4.2.1. Wênê cêgîr

Wênê cêgîr ew wêneye yê ku ji bo me saloxdana tiştêkî di doxê cêgîr û sekinay dike, çûnkî (*ew wêneye ya êksere ku dûryeka diyarîkirî heye ku çi bihayekê sirûştdayê hilnegirtye hêlên cêgîr bûnê û werarê ne sekinaye*) mirov di vî core wêney da hesit bi pêkhata wê nake û behra pitir ji karên ristên hozanê ji demê borye, yan jî karê bêhêze¹¹⁵, ji bo xuya kirina vê wêney di nav hozanên BOTANÎ da, mîna dibêje:

Deşt û çiya û dar

Bajar û gunid û war

Gelî di pesar, dol û kendal

Avên wan pak, sar û zelal

Hawar jiyane

*Roj barane*¹¹⁶

¹¹⁵ dr. şukirî mihemed `eyad, ellxe wel eybda`, înter naşyonel, libinan, 1988, s87.

¹¹⁶ sebirî botanî, dilstan, r.29.

3.4.4.2.2. Wênê Livok

li vêre hozanvanî wêneyekê bê bizav ji saloxdana siruştê berçav dike, bi rêya çendîn wênê sade mîna (deşt, çiya, dar, bajar, gunid, gelî, dol, kendal, av, sar, pak, zelal, roj, baran) diustkirîne, mebesta wî ji wan wêneyên cêgîr û bê bizav ewe ku jyana bi dirustî her ew jiyane ya mirov di nav deşt û çya û gunid û bajêran dijît û têhina xwe bi avên wê yên sar û zelal bişkîne, eve jî saloxdaneka rêk û pêk ji bo siruştê di kawdaneka cêgîr û sekinayayda, anku hozanvanî mîna hunermendekê serkeftî tabiloyek ji siruştê dirustkirye.

ev wêneye berovajî wênê cêgîre her ji navî ya xuyaye, çunkî (ev core wêneye di byavekê berfreh tirda ji wêneyê cêgîr were kêşan, dîmenên wî pir bizavin û ji kawdanekî ji bo yên dn dihête gihorîn, wênegirên diramayê dikarin vî wêney bi rêya kaêra telefîzonî yan jî sînema bigirin û kar di van wêneyanda derbirînê ji demê niho an jî aynidê dike)¹¹⁷ mîna hozanvan dibêje:

agirî şerî geş bikin

ruyê dujminê reş bikin

Kilîla aşitî şere

Bisuşin hişk û tera

Wêran nebit mala we

Bilind nabit ala we

Di vêreda hozanvan wêneyekê livok bi rêya çenid eênayekên sade mîna (agir, şer, geş, ruyê, dujmin, reş, kilîl, aşitî, hişik, ter, bilinid, ala, mal) herwesan bi rêya karên daxwazyê mîna (geş bikin, reş bikin, bisujin, wêran bebit, bilind nabit) ku amajê ji bo karê fermanî didet hatye diristkirin. anku wêneyên livok di kiryarên (şerkirinê, reşkirinê, sutinê)da xuya dibin.

¹¹⁷ Kerîm Şareza, Wêney Şî Rî Kurdî Le Nêwan Çespaw Û Molarîda, Govara Raman Ji: 15, Hewlêr 1997.R.11

3.4.4.2. Wêne Ji Layê Rewanbêjyêve,

derbarê rolê regezê rewanbêjyê di hoznaêda (Dr. Mihemed) bekir dibêje (regezên rewsnbêjyê di wêneyên hozanî da, ne tinê hokare ji bo ciwankaryê, belkî bi têkelbûna wan digel babetên wêneyda, dibe pişkek ji pêkhênerên binyatê wêney)¹¹⁸

wêne ji layê rewanbêjyêve li ser çar coran dabeş dibe:

3.4.4.3.1. Wênê Lêkçwandinê

ev core wêneye birîtye ji (saloxdana tişteki, bi tişteki din û dibe binyatê pêkhatina vê corê wêney, û pêdivyê, amajê bideyne hindê ku lêkçwandinê çar regez hene: lêçû, lewçû, amirazê lêkçwandinê, rûyê lêkçwandinê) ((Dr. mihemed bekir, pexşane şî rî kudî, gutarî şî rî, r.58))

hozanvan dibêje:

pîre jinên weke me

*li ber dîwaran mabûn*¹¹⁹

di vêreda hozanvan bê xudan û bê destelata xwe lêkçwandiye bi dan `emrya rezîl û bê çare ewên ki dumahî ya jyê xweda bê xudan dimînin û li ser cada dijîn, şrovekirina vê nimunê li gor regezên lêkçwandinê dê bi vî rengî li xwarê be:

lêçû: pîre jinên

lewçû: me

amirazê lêkçwandinê: weke

rûyê lêkçwandinê: liber dîwaran bûn

corê lêkçwandinê: serbesit

hozanvan dibêje:

avîna te şepalê

¹¹⁸ Dr. Mihemed Bekir, Pexşane Şî Rî Kudî, Gutarî Şî Rî, R.61.

¹¹⁹ sebirî botanî, dengê metîn û cudî, r.58.

*kirim memê zîndanê*¹²⁰

lêçû: mem

lewçû: min (mi)

amirazê lêkçwandinê: tûneye

rûyê lêkçwandinê: evînye

corê lêkçwandinê: cexitkirin

3.4.4.3.2. Wênê Xwaze

ev wêneye ji encamê bikarîna peyvê ji wta wêya sereke ji bo watayeka din dihête diridtkirin,¹²¹ anku peyv di vî core wêneyda ji bo wtaya wê ya rastiyê nahête bikarînan, belkî mebest pê tiştêkê dine. ev core hozane di nav hozanên botanî da hene.

bo nimune:

şivanê gelê kurde

*mîna gizîrê gunide*¹²²

di vêreda wênê xwazeyî bi rêya peyva (Şivan), çunkî ev peyve amajê nadete wê ramanê ewa di rastyê da ji bo hatye danan ku şivanê liber pazye. belkî mebestê wî serkirde û kesê xemxore.

¹²⁰ Sebirî Botanî, Şîn û Şadî, R.21.

¹²¹ Nizar Nurmanî, Xwîn Di Hembêzê Da, Vekolîneka Formalîstî û Şikarye Di Şi`Ra Mweyd Teybî Da, Ç: 1, Dezgehê Sipîrêz-Dihok Çapxana Wezareta Perwerdê, Hewlêr, 2005 , R.216

¹²² Sebirî Botanî, Dengê Metîn û Cudî, R.35

3.4.4.3.3. Wênê Xwastinê

hinek di wê bawerê dane kiu eger (peywendya di navbera watay mecazî û heqîqî da peywendîyeka wekhevî be birîtye ji wênê xiwastî)¹²³ bi vê çendê xwastin tinê wekhevîyeka kurt krye, lê jê rewantire. anku wênê xwastinê birîtye ji xiwastina saxleta tiştêkî ji bo tiştêkê din bi mercekî binyatê peyva hatye xiwastin bihête gihorîn, wênê xiwastin ji sê regezan pêk dihêt mîna (jê xiwastî, bo xiwastî, belge) eşkiraye ev core wêne dinav hozanên BOTANÎ da hatîne bikarînan.

mîna dibîje:

zêrê bizava wî nebit

ji bo nan û derman nebit¹²⁴

di vê parçe hozanê da wêneyên xwastinê were eşkira kirin li gor van regezan:

bo xiwastî: zêr

lêxiwastîÊ dyar nîne

jê xiwastî: bizav

di vêreda corê xwastinê: xiwastina veşartye.

3.4.4.3.4. Wênê Dirkeyî

Wênê dirkeyî derbirîne ji eşkira kirina tiştêkî çêdibe ji encamê bikarînana tiştêkê dinve ku amajê bi wî tiştî dide, wtaya wî eşkira dibe çi bi rêya eqlî an zanîne û dirkandinê ji havelnavekî an tiştêkî saloxdanê dike.¹²⁵ kewate em dikarin dirke amajekirine ji bo watayekê, belê ne bi renekê eşkire û ne ligor wan peyv û axafitinin hatyne bikarînan ji bo vê watayê, belkî bi rêya watayeka din ya nêzîk ji watayê

¹²³ Osman Husên Ebidulrehman, Rolê Paradokis Di Pêkhata Wênê Hozanê Da -Kirmincya Serî- Wek Nimune, Ç1, Çapxana Xanî, Dezgehê Sipîrêz, Dihok, 2008, R.110

¹²⁴ Sebirî Botanî, Şîn Ê Şadî, R.21

¹²⁵ Dr. Nasir Sebirawî We Axerûn, El Belaxe We El Tetbîq, T:3, Metbe`E Wezare El Terbye, Elminqihe, 1996, S59

mebest pê. Herwesa (direk êke ji corên derbirîna veşartî û şêwazekê huneryê gutnêye)¹²⁶ ev core wêneye di nav hozanên Sebirî BOTANÎ da hatye bikarînan.

Bo nimûne:

Liber dengê dehol kurd

*Xwe helavêjin pale û cotyar*¹²⁷

Di vêreda wêneyekê dirkeyî bikarînaye, çunkî peyva (dehol) dû watayan bixwve digre. Wataya ferhengî êk ji amêrên muzîkêye bi rengekî berfreh dinav ahenig û şehyanan da were bikarînan, yan jî amêrên derbirînê ji keyf û xweşyê ji dev hinek kesan, wataya dwê (şorişe).

¹²⁶ Osman Husên Ebidulrehman, Rolê Paradokis Di Pêkhata Wênê Hozanê Da -Kirmincya Serî- Wek Nimune, Ç1, Çapxana Xanî, Dezgehê Sipîrêz, Dihok, 2008, R.111.

¹²⁷ Sebirî Botanî, Şîn Û Şadî, Ç:2, R.18.

ÇAVKANÎ

- Ebidul Selam Necmedîn`Ebidulla, Şîkirdneweî Dqî Ş`Rî Le Rwî
Zimanewanyewe, Nama Masterê, Zankoya Selahedîn, Kolîja Ziman, Hewlêr,
2007.
- Babil Ehmedî, Saxtar We Tewîl Misn.
- Bahoz Botanî, Ji Keşkola Şîn Û Şadî, Rojnama Bizav, Ji:7, Bexda , 1989
- Botanî, Sebirî, Lexom Edwêm, Rojnama Hawkarî, J1175, 1990
- Can Kuynar, Bina Lixe El Şi'r, Terceme: Dr. Ehmed Derwîş, S
Conasan Karil, Nezerîye El-Edebye, S85.
- Desteka Nivêseran, Çirayên Rewşenbîrya Kurdî Sebirî Botanî, Kovara Peyv,
1999`de, R2.
- Desteka Nivêseran, Sebirî Botanî Mişexit Bûneka Bê Dumahî Û Wexereka
Sermedey, Kovara Peyv, J 9, 1999, R2.
- Desteka Nivêseran, Xeberekê Nexweş, Rojnama Botan, J 5, Çirya Duwê 1991.
Dîwanên Serbirî Botanî (Şîn Û Şadî, Dilstan, Bilura Çîyan).
- Diz Semîr, El-Neqid El-Erebî Ham Rewa El-Hedase.
- Dr. Ebdulla Yasîn Elî, Honrawey Bergirî Le Berhemî Çenid Şa'îrêkî Kirmancî
Seru Da (1939- 1970), Le Bilawkirawekanî Korî Zanyarî Kurd, Hewlêr, 2005.
- Dr. Edinan Husên El-'Ewadî, Lixe El-Şi' Rye Fî El-'Êraq Beyne Mtle' El-Qerin
El-'Eşrîn We El-Herib El-Alemye El-Sanye, Menşurat Wezare El-Seqafe We
El-Î'alem, Sisile Dirasat (375), Dar El Hurîye Liti-ba'e, Bexdad, 1985.
- Dr. Enîf El-Behinsî, Îlim Cemal We Qerat El-Nes El Fennî.
- Dr. Hesen Mihemed Nuredîn, El- Şi'rye We El-Qanun El- Şi'r.
- Dr. Ibrahîm El-Samerayî, Lixe El-Şi'r Beyne Cîlîn, Dar El-Seqafe We El-
Neşir We El-Tewzi', Beyrut, Sene (?)S.
- Dr. Mihemed Bekir, Kêş Û Ritmî, Şi'rî Folkilorî Kurdî, Dezgehê Aras,
Wezaretî Perwerde, Hewlêr, 2004.
- Dr. Mihsin Etîmiş, Dîr El Melayk, T1, Wezare Elseqafe We El Î'lam, Bexdad,
1986
- Dr. Sasîn Sîmun 'Esaf, Elsure Elş'rye We Nemazicha Fî Îbda' Ebî Newas, T:1,
Elmuesese Elcamî'e Lîdirasat We El Neşir We Eltewzî', Beyrut, 1982.

Dr. Selah Fezil, Esalîb El-Şi'rye El-Masire.

Dr. Usman Mewafî, Mwesese El Seqafe El Cami'e, Eskenderye, Sene (?).

Dr. Wehab Elî El 'Idwanî, Elzerure Al Ş'Rye, Cami`E Elmusil, Metbe`E Te`Lîm Alî, 1990.

dr.şukirî mihemed `eyad, ellxe wel eybda`, înter naşyonel, libinan, 1988.

Ehmad Mihemed, Sinaîye El-Şi'r We El-Nesir Fî El-Fikir El-Neqidî.

Ehmed Mela, Xeyalkirdinî Wêney Ş'ri Ê Girftekanî Cîhanbînî, R17.

Ehmed Yusif Dawid, El-Neqid El-Şi'r, S16.

El-Şî'r El-Înzyah, Emîme El-Rewaşide, S58

Ezîz Gerdî, Edeb Ê Rexne, Ç1, R61

Ezîz Gerdî, Edeb Ê Rexne, Ç1, R62.

Ezîz Mehmud Pur, Zimanî Pêwer Ê Zimanî Şî'rî Yan Marofiskî, Govara Raman, Ji:80, Ji Weşanên Nawendî Roşnbîrî Gulan, 2003, R.58 – 59.

Hemdye Hesên Mihemed, Layê Hunerî Ê Naveroka Hozana (Sebrî Botanî), Nameya Masterê, Zanîn-geha Dihokê, 2009, R.78.

Hesên El-Bena Îzedîn, El-Şi'rye We El-Seqafe, S53.

Hesên Nazim, Mefahîm El-Şî'rye, S18.

Îzêt Fendî, Dilstana Xwe Bernadem, Rojnama Botan, J 5, Çîrya Duwê 1991'de, R5.

Mehmud Ketunî, El-Luxe Şi'rye, Dîrase Fî Şi'r Hemîd Se'îd, 1997, S19.

Mifahîm El-Şî'r, Hesên Nazîm, S36.

Mihêdîn Sibhî, Nezerye El-Neqid El Erebi We Tetewirha Îla Enasir, S32.

Mihemed Eles'ed, Meqle Fî Ellixe Şi'rye, Mekan Tebi' (?), Sene (?), S.69.

Mihemed Elî El Hisnî, Lixe El Şi'R We `îlim Eswat Ellxewî, Micelle Seqafe, El Ededan: 8+9, Dar Elhurye Lîtîba`E, Bexdad, 1990, S46.

Mihemed Xefur Mihemed, Rêbazî Romansîzim Le Şi'rî Kurdîda 1918-1945, Nama Masterê, Zanîn-geha Selahedîn, Kolêjî Perwerde, Hewlêr, 2005, R.90.

Mîkayl We Bixasîr, M'ayr Tehlîl El-Islub, S31.

Nazik Melayke, E'mal El-Nesiye El-Kamile, R323.

Newzad Ehmed Eswed, Bîrî Rexney Hawçerx, B.C, B.M, R2016.

Norman Firîdman, El Xeyal We El Îslub We Elhedase, T: Cabir 'Sfur, T:1, Elmecilis Ele'la Lîl Seqafe El 'Amme, Mekân Tebi' (?), Sene Tebi'(?), S.205.

Norman Firîdman, Elxeyal Elislub El Hedase, S207.

Sadiq Elbehadîn Amêdî, Rêzmana Kurdî, Ç:1, Çap û Weşanên Dar Elseqafe
`Amme, Bexd, 1987, S.445.

Sebirî botanî, Dengê metîn û cudî, R26.

Sebirî Botanî, Dilstan, R.28.

Sebirî Botanî, Pahîz, R43.

Sebirî Botanî, Pahîz, R8.

Sebirî Botanî, Şîn û Şadî, Sebirî Botanî, Ç:2, Çapxana Elhewads, Bexda,
1984, R.40.

Sebirî Botanî, Şîn û Şadî, Ç1, Çapxana El-Edîb El-Bexdadye, Bexda., 1979,
R.6.

Şewket Tahir Sindî, Mam Botanî Ji Bûna Te Ya Nû Silav û Silav, R142.

Şi'rye El-Xetab El-Edebî, Ferîde Mulî, S44

Tahir Mistefa Elî, Şi'rye El-Islub El-Rewawî Fî Xetab Mehmud El-Birîkan,
S16:

Tizfitayn Tuduruf, Neqîd El Neqîd -Rwaye Te'elûm-, T: Dr. Samî Sudan,
Mirace'e Lîlyan Suydan, T:2, Dar El Şûn Seqafye Elamme, Afaq Erebye,
Bexdad, 1987, S34:

Umer Bnr, Fazil, Torevanêd Xwe Binasin, Kovara Dengê Me, J3, Çapxana El-
Hewadis, Bexda, 1984, R.6.

Weşanên Êketya Nivîserên Kurdistan-Dihok, Dîwanên Botanî (Şîn û Şayî,
Dilstan, Bilura Çîyan, Ç1, Çapxana Hawar, Dihok., 2008, R.179.

Xeyal Wel Îslub We Elhedase

Zana Xelîl, Şi'ryet Le Dwa Weswesey Kirîstî Kaznakîsda, R198.

ENCAM

Li gorî hin delîlên ku me di vê tezê de aşkere kirine, em dikarin bibêjin ku Sebirî BOTANÎ mîna nvêskar, hozanvan, zimanzan, rojnamevan, cengawer û şoreşgêr û kesekê xebatgêr û hez jê kire rastî û aşityê û dêmukrasyê mirov perweran hate naskirn

Botanî Ew helbestvanekî girîng yê edebiyata nû bûye. Hem bi zanistên dînî re hem bi tesewufê ra hem jî edebiyatê re mijûl bûye.

Di warê şêwe û şêwazanda BOTANÎ xandîngeheka hozana kurdyê, çûnkî wêne û huner û muzîk û peyv û awazên wî digel wê naveroka niştmanî û miruvatyê bandor kirye ser sedan kesan û li ser şêwazên wî vehandîne.

BOTANÎ di nivîsîna hozanê da zêde serketî bû, çî ji layê hunerî û şêwazî ve çî ji layê naverokê ve çûnku ew bi êk ji nokerên hozana kurdî dihête naskirn, ji salên çlan ji sedê bîstê û hêrve rolekê dyar di vî bîavîda hebû. Bitaybetî ew mîna endazyarekê zimanî dihête naskirn û bi rêya hozanê karî xelkekê zor fêrî zimanekê petî biket. Nexasme jiber asanî û sivkî muzîka hozanê wî.

BOTANÎ bi gutin, nêvîsîn kiryar eşkirekir hozanvan û nivîskarekê pêgîre, vê pêgiryê ew û berhemêmên wî herdû zîndîkîrn, berhemên wî jî wî baştirîn gruvîn vê rastyê diçespînin.

Babetên SEBRÎ BOTANÎ nivîsîn bi giştî û hozana wî bitaybetî diarastekirîne û babetên armanic Bern, li her çekî wî çend mebest bi wê nvêsinê hingavtîne û şyaye wan wêna bikete didlê xelkîda ji zarokînyê taku digehîte pîrekê.